

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

ZIVISTAN/2010



Hevpeyvîn li ser defileya kinc û bergên jinên kurd bi Xanim Inci Hakbilenê re

Destpêka axaftinê û fonksiyonên ziman

Prof. Dr. İlhan Kızılhan

44

Birinci Dünya Savaşı sonrası ve 1921 öncesi
Koçgiriden sürgün edilen bir ailenin mensubu,
İbil Pano Koçgiri ile söyleşi

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 44 zivistan 2010

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Têkili/lişkî

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Amerika: Mam Recall, mamrecall@yahoo.com

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa: Muzaffer Özgür/Birnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyay
Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanyay 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" PlusGiro-Stockholm/Sweden

BIC: NDEASESS

IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Gruba govenda xortan
di şeva Încovê ya li Danimarkê de

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re
tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li
xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.



Wêneyên li berga pêş û paş:
Defîleya cil û bergên kurdî, jî arşîva İnci Hakbilenê.



- 2 Ji Bîrnebûnê, *Ali Çiftçi*
- 3 Şeva Încovê, *İrfan Baysal*
- 7 Li Salzburga bajarê Avusturyayê şahiya kurdên Aksarayê, *Ömer Yüce*
- 9 Hevpeyvîn bi xanim İnci Hakbilenê re, *Sami Ekici*
- 12 Destpêka axaftinê û fonksiyonên ziman, *Prof.Dr. İlhan Kızılban*
- 17 Reva me ya Stembulê, *Nuh Ateş*
- 21 Rêwî, *Seyfi Doğan*
- 24 Êzîzê Mahcîr, *Yusuf Yeşilöz*
- 28 Aştîperweriya gelê kurd li ser dîroka gundî Birtalîkê û Mistî Alê, *Ekrem Harmancı*
- 31 Heşkêm, *Nuh Ateş*
- 33 Tama derewan, *Mem Xelikan*
- 35 Îzbend, *Nuhê Hecê*
- 37 Esrara Kaso, kêf û sonda Heydo, *Muzaffer Özgür*
- 41 Roja Zimanê Zikmakî û Manx, *Ecevit Yıldırım*
- 43 Geşta Kurdistanê II, *Xayyam Rizgar Celikanî*
- 47 Koçgiriden sürgün edilen bir ailenin mensubu, İbil Pano Koçgiri ile söyleşi, *Evîn Çiçek*
- 80 Anemneza bi kurmancî, *Mem Xelikan*

Sal 2010

Di rewşa kurdên me yên bakûr de her wek salên borî, di aliyê ziman, perwerde, çand û azadiya rêxistinî de tu guhartin nebûn. Hêviyên ku sala borî çêbûbûn jî mixabin bi van bûyerên dawî hatin şikestin. Dîsan bi sedan kurdên siyasi yên ku bi raya gel li bajarên kurdan hatibûn hilibjartin, hatine girtin. Hêzên tarî ku dixwezîn rê li ber pîrsa kurd bigrên, li Tirkîyê rabûne ser piyan! Ev bûye heft sal ku hukumeta AKPê bi raya kurdan li ser hukum e, heta niha tenê bi gotinan ma. Partiya ku serokê wê Recep Tayîp Erdogan e digot: "*... li Tirkîyê pîrsa kurd heye. Ew pîrs jî pîrsa min e û em ê pîrsa kurdan hel bikin!*" tu dinêri niha ji zarokên kurdan re jî tehamul nakin, bi hezaran zarokên kurdan hepsî ne, zarokên biçûk jî têne girtin!... Dema rê li ber dîtina azadîyê bêst girtin hêviyên ku çêbûne jî tên xirakirin. Di demên wiha de divê bi rêya medyaya ku îroj hewqes berfiref bûye, em bo mafên xwe yên kesayetiye û li nîrxên xwe yên pîroz xwedî derkevin!

Ev 87 sal in ku li Tirkîyê polîtîkaya asîmîlekirin û qirkirina kurdan her berdewam e. Encama vê polîtîkayê ye ku îro bi sed hezaran kurdên me yên Anatoliya Navîn û kurdên ji Kurdistanê bi miljonan li welatên Ewropayê bûne koçber. Ji bo ku bikaribin di jîyana koçberiyê de çanda xwe biparêzin pîraniya hemwelatîyên me yên ji Anatoliya Navîn li van welatên Ewropayê bi navê komeleyên gundên xwe, xwe bi rêxistinî dikin.

Li Kopenhavna li bajarê Danîmerqê di 15.01.10 da Komela Încovê şahiyeka çandî çêkir. Şahiyeka şên û kurdî ku ji xelkên Încov û gundên derûdora xwe beşdariyeka berfireh hebû, bi serkeftî derbas bû. Li Salzburga bajarê

Avusturyayê şahiya kurdên Aksarayê di dawîya sala borî de çêbû, hûn dê zexerê van herdu şahiyên di vê hejmarê de bixwînin

Sami Ekici, mamosteyê zimanê kurdî li Hamburgê, ji bo kovara me hevpeyvînek li ser defileya kinc û bergên jinên kurd bi xanim Inci Hakbilenê re kiriye ku ew bi xwe jî ji kurdên Heymanê ye.

Evin Çiçek di vê hejmarê de bi sernivîsa "*Birinci Dünya Savaşı sonrası ve 1921 öncesi Koçgiriden sürgün edilen bir ailenin mensubu, İbil Pano Koçgiri ile söyleşi*" hevpeyvîneka dîrokî kiriye. İbil Pano yek ji endamên şahîdê qirkirina Koçgiriye ye û serpehatiya kalê xwe bi me ra parve dike.

Birêz Prof. Dr. İlhan Kizilhan li zanîngeha Konstanz û Freiburga li Almaniyayê di warê lêkolînên pevcûn û aşîtiyê de dixebite. Bi navê *Destpêka axaftinê û fonksiyonên ziman* kurtelêkolînek di derbarê ziman û kesayetiya zarokan de nivîsiye.

Muzaffer Özgür, Xayyam Rizgar Celikanî Ecevit Yıldırım, Nuh Ateş, Mem Xelîkan, Seyfi Dogan, Yusuf Yeşilöz bi hekat, gotar, gername û kurteçîrokên xwe yên zarxweş ve ev hejmara jî bo we xwendevanên birêz dagirtine.

Xwendevanên bi rûmet, di hejmara 43an de me bi sernivîsa "*Yek ji me Mam Recall*" re hevpeyvînek kiribû. Di hevpeyvîne de jî dîyar e ku birêz Mam Recall li ser ziman xebatên wî yên hêja hene. Ji vira ha ew hem dibe yek ji nivîskar û hevkarê kovara me û hem jî ji bo tekiliyê li Amerîkayê dibe berpîrsê kovara me. Bi vê wesêleyê em li ser navê redaksiyonê dibê: tu bi xêr bê, birêz Mam Recall!

Heta hejmara bê şad û bextewar bin!

Ali Çiftçi



Li Kopenhavnê di 15.01.10 da Komela Încovê li Danimarkê şeveke şahiyê çêkir. Ev li dora 40 salan e ku kurdên me yên Anatoliya Navîn li Danimarkê dijin. Êdî xwedanê sazî û komelan in. Li xwe xwedî derdikevin û xwe diparêzin.

Şeva şahiyê ji aliyê Enver Kesen, seroke komalê Halil Kara, Fahri Bardakci, Rahman Kalkan û Erol Kizilkaya ve hatibû amadekirin.

Şev di cihekî mezin da hate darxistin. Li ser hezar kesî beşdar bûn.

Di bernama şevê de axaftin, stran, govend û xwarin â vexwarin hebû. Bername pir dewlemend bû. Ji Ewropayê û ji welat mêvan beşdar bûn.

Di şevê de pir mêvan, şexsiyet, siyasetmedar û berpirsiyarên komelan beşdar bûn. Ji şarederiya Încovê Îlyas Kara (serok) Sirri Kesen, Mehmet Yazar, Bahattin Hacıoglu. Li ser navê kovara Bîrnebûnê, ji Swêdê xwedanê weşanxana APECê Ali Çiftçi.

Ji Elmanyayê Dr. Nebi Kesen, Komela Celika, Cutka, Şerefli û Hecilera jî beşdar bûn. Ji alî Bîrnebûnê Irfan Baysal û rojnama Zaman jî hatibûn dawet kirin.

Siyasedmedarê ku hatin Mahmut Erdem, Bilal Înekci, Erdal Çolak, Ahmet Degirmenci û Ahmet Kucukakin mebusê Sosyal Demokrata Yıldız Akdoğan jî mêvan bûn. Yıldız Akdoğan ji kurdê Çorumê ye.

Di vebûna şevê de Dr. Nebi Kesen di axaftina xwe da dinamika civakê hîna ziman û bal kişand ser yekitiya kurdan. Hikmet Çoban stranên mehelî got. Serokê şaredariya Ishøjê Ole Bjostron li ser biratiya şaredariya Ishøj û Încovê deng kir. Biratîyên her du şaredariyan hat teyit kirin. Lars Aslan Rasmussen bi navê serokê şaredariya Kopenhavnê beşdar bû. Murat Kuçukavci bi stranên mehelî rengêk da şevê.

Erkan Kilic û koma wî stranên mehelî gotin. Ev koma ji Sarikayayê ye.

Nurettin Çiçek jî bi stranên ji Anatoliyê beşdarî şevê bû. Serokê şaredariya Încovê Ilyas Kara silav û hurmetên xwe anî ziman. Ali Çiftçi di axaftina xwe da li ser rewşa zimanê kurdî û parastina zimanê zikmakî sekinî û bal kişandin ser perwerdeya bi zimanê kurdî.

Canê jî bi stranên xwe mêvan li Anatolya Navin gerandin. Canê bi xwe ji Încovê, keça Mehmedê Sofî ye. Di dawiya şevê de hunermendê me yî bi nav û deng Şivan Perwer derket. Bi axaftin û bi stranên xwe çoşeka mezin da mêvanan.

Îrfan Baysal

Mêvanên birêz, hevalên delal,

Şeva Încovê ji dil silav dikim û ez jî dibêm: Hûn bi xêr hatin!

Mêvanên ji Încovê, birêz serokê belediyê, İlyas Kara, endamên meclîsê Sirri Kesen, Bahattin Hacıoglu û Halit Yazar bi hesreta Încovê ji dil silav dikim. Serokê belediya Ishojyê birêz Ole Bjostrop: Hûn jî bi xêr hatin şeva Încovîyan! Hozanê kurdan birêz Şivan Perwer jî beşdarî şevê bûye. Berî 35 salan li Încovê me guhdariya sitranên Şivan dikir. Niha ew li vir e û di nav me da ye. Birêz Şivan, ji te ra jî dibêm: Tu bi xêr hatî, li ser seran, li ser çavan!

Berpîrsê kovara Birnebûnê û hevalê delal, Ali Çiftçi ta ji Stockholmê hatiye şevê û niha di nav me da ye. Kek Ali, tu jî bi xêr hatî, li ser seran û ser çavan! Ez pîr kêfxweş im ku îro di şeva Încovê ya didûya de me! Bi hezaran kilometre ji Încovê bi dûr, îro ewqes kes li Kopenhagenê hatiye cem hev. Va tişteki pîr baş, bi rûmet û bi mana ye. Ji bona vê spasî hemû hevalên Komala Încovê û Fona Cenazê dikim. Mala we ava! We, kar û bareki giran dayê ser milê xwe: Xwedê ji we razî be! Ez bi hevalên wek we serbilind im û we hemûyan pîroz dikim.

Mêvanên birêz, hevalên delal,

Di şertên xerîbîyê û koçberîyê da em hemû hatine cem hev. Bi şênahîya Încovîyan, bi şeveka tîji kilam û govendan dixwazin hesreta xwe derbas bikin. Di nav me da, jî gundên dora Încovê wek Kelhesen, Hecîlera jî mêvan hene. Li hêla din, mêvanên şevê yên ji Kurdistanê jî hatine. Bona vê, ev şeva şeveka kurdên Kopenhagenê ye û divê weng bê fêr kirin. Berî çend salan, li Ewropayê pîr caran em salê carekê li Newrozê dihatin cem hev. Niha her dawetek, her nişan û sûnetek bi şiklê Newrozê tê pîrozkirin. Îro her salekê bi dehan şevên gundan li Ewropayê tene organîzekirin. Şeva Încovê jî yek ji wan e û em pê serbilind in.

Bo ziman û çanda me, van şênahîyên weng pîr girîng in. Em çiqes bi ziman û çanda xwe ra girêdayî bin, ewqas jî em ê ji wê îstifade bikin. Zarok û xortên me, divê zimanê dayîka xwe baş bizanin û lê xwedî derkevin. Pêşgirtina li asimilasyonê di vê rêyê ra derbas dibe. Dibêm: Em bi kurmançî deng kin! Em bi kurmançî bixwînin! Em bi kurmançî binivîsin! Ziman hebûna me ye!

Çend hevalên ji kurdên Anatolyê ji salan vir da xizmetek mezin û rind dikin. Ew bi navê Bîrnebûnê kovarekê derdixin. Divê hemû heval û mêvan xwedî li vê kovare, xwedî li Bîrnebûnê derkevin, bixwînin û bidin xwendin. Ji ber ku Bîrnebûn xizmeta ziman û çanda me dike. Li Anatolyê, Încov û bi dehan belde û gundên din yê Konya, Ankara, Kirşehîr û Aksarayê hene. Mezinên me berî bi sedsalan hatine van deran û gund ava kirine. Me heta îro zimanê xwe ji bîr nekîrîye û edetên xwe parastine. Divê li Ewropayê jî em vê berxwedanê berdewam bikin. Mêvanên birêz, hevalên delal: Ji wezîfeyên me yek ji ew e ku em pîrsa kurd herdem bînin bîra xwe. Heta ku kurd li Tirkîyê û Kurdistanê azad nebin, ziman û çanda me jî ji bin tesîra asîmilê û bîrbûnê xelas nabe.

Bi hezaran kes ji bo nasname û heqên me canê xwe dane. Hîn ji bi milyonan xweng û birayên me di vê rêyê da ber xwe didin. Kar û xizmetên ku em jî bikin hene. Mîna birayên me Nurettin Çiçek, Hikmet Çoban, Murat Kuçukavci û xwanga me Canê! Van hozanan jî ji dil pîroz dikim. Di vê şeva me da, ew ê bi dengên xwe yê xweş û bi zîmanê me yê şîrîn me coş bikin. Hozan û hunermendên me divê hîn ji pîr bibin.

Kurmanc, zaza, şexbizîni, soran û goran, me hevdu li Kopenhagênê û bajarên din yê Ewropayê nas kir. Bi van xwang û birayên xwe ra jî divê em nêzîkî hev bin û ji hevdu tiştan fêr bibin! Em kesên ji Încovê, perçeyek ji civata kurda ne. Kêfxweşî û serêşyên me jî divê bi hev ra bin. Eslê me yek e, zîmanê me yek e, nasnameya me yek e. Em yek millet in û bi vê jî serbilind in.

Mêvanên birêz, hevalên delal, ez naxwazim pîr dirêj bikim. Bi rastî, şeva Încovê karekê pîr bi qîmet û baş e. Carek din him hevalên ku organize kirine, him jî xwediyê Başak Sarayê, pîsmamê min, Mustafa Sutçu ji dil pîroz dikim.

Ji Hamburgê heta Kopenhagênê, ji Kopenhagênê heta Încovê, bi hezaran silav ji we ra!

Bîrnînin di xêr û xweşiyê da!

Yeniceobalılar Gecesi

"Yeniceoba Kültür ve Dayanışma Derneği"

Şivan Perwer

Konuk Sanatçılar

Hediye Çekilişleri

Nurettin Çiçek

Murat Kuçukavci

Canê

Hikmet Çoban ve grubu

Yeniceoba Belediye Başkanı İlyas Kara ve Işhøj Belediye Başkanı Ole Bjørstrop

ISHÖJ KÖRESKOLE

Konstantinopol

DA-BI

GS-DIGITAL

Venedik

Avrupa Davetiye

onfone mobil

BASAK SARAY DÜĞÜN SALONU

Tarih: 15-01-2010

Kapı Açılış: Saat 16.30

Bilet fiyatı:

6 - 12 yaş arası 100 kr.

12 - yukarıya 200 kr.

(Yemek + çerez + meyve - içecek)

* 0 - 6 yaş arası giriş ücretsizdir

Bilgi ve Bilet Satış

Tel: 26 25 01 23

Tel: 20 15 33 98

Tel: 22 84 85 95

Başak Saray Düğün Salonu
Adres: Bådehavngade 57,
2450 København SV.

Mêvanên birêz, amedekarên şevê, haval û nasên bi rûmet,

bi rêz we hemûyan silav dikim mala we ava ku we ev derfeta da me, em îro bi hev re, li vir di nav vê şenahîyê de ne! Ji bo ku ez wexta we pîr negrêm û di şenahîyeka wiha de serê we neyêşînim ez ê tenê li ser çend noqteyên girîng yê zîmên rewestim.

Zîmanê mîletekî çiqas dewlemend û pêşketî be jî ku neyê bikarnîn nikare jî bo pêşerojê bibe zîmanê zarokan. Zîman divê bijî, yanê di her qada jîyanê de divê zîmanê kurdî bibe bîngeha pêwendiyê. Wexta ku em bi zîmanê xwe bi hev re li ser dîtî, çand, civak û aborîyê deng nekin û kul û derdên xwe, xewnên xwe bi hev re parve nekin, zîmanê me nikare bijî. Ku tenê hinek rewşenbîr, nivîskar bi zîmanê kurdî deng bikin, ev têr nake.

Wek kurd li kuderê dibe bila bibe, ku em bi hemû sazî, rêxistin û komelên xwe ve bi rasti bixwazîn dîsan vegehin ser zîmanê xwe, divê em di jîyana xwe ya rojane de, di pratîk û teorîyê de bernamêyên xwe biguherînin. Bi taybetî mirovên nas, yanî berpîrsên civatê, serokên rêxistinên, komelan, siyasetmedar, hunermend, nivîskar û hwd... divê gavên pêşî bavêjin û bi fermî bi zîmanê kurdî biaxîfin. Bo nîmûne divê di şî û şahîyan de, di civînên malbatî û komeleyan de em bi zîmanê xwe deng bikin. Dema em wek dê û bav rûmetekê bidî zîmanê xwe dê zaroknên me jî pê bizanî, fêr bibin û biparêzî.

Zîman di pêşveçûna şexsiyeta zarokan de rola herî mezin dileyize. Zîman dibe bîngeha nasnameya zarokê û şexsetiya wî. Bi zîmanê dayikê zarok fêrî jîyanê dibe û derûdora xwe nas dike. Herwiha bi zîmanê xwe li gor erf û edetên xwe fêrî tiştan dibe û dinyaya dinase. Çand û folklorê xwe fêr dibe û dikare bi pêş bixe. Dema em zîmanê xwe fêrî zarokên xwe nekin, ew ê bi zîmanekê din fêrî çand û dîrokeka mîletekî din bibin û dê durî mîletê xwe bikevin û bi vê re jî çand, erf û edetên me yê bi wan xerîb bî. Zarok bi zîmanê bav û kalan dibe yek jî civata xwe û civaka xwe bi serbilindî, şahî û şerefeke mezin dinirxîne û lê xwedî derdikeve.

Îro li welatên Ewropayê, ku car caran pîraniya ciwanên kurd li nasnameyên xwe xwedî dernakevin û nasnameya xwe negatîf şîrove dikin yek jî sebebên ew e ku zîmanê xwe yê dayikê baş nizanî. Mîrasa her mîletekî di çand û folklorê wî mîletî de veşartîye. Her mîletek li ser wê mîrasa xwe, xwe bi pêş dixê û pê serbilind dibe. Ew parastina mîrasê jî bi zîman ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê jî zîman pîr muhîm e!

Ev deh donzdeh sal in ku em kovara Bîrnebûnê li derveyî welêt, li Ewropayê derdixin. Gîraniya naveroka kovarê li ser vê meselê ye. Berhevkirin û parastina çand, zîman, folklor û dîroka gelê kurd û bi taybetî jî kurdên Anatolîya navîn e. Ew kovareka lêkolînî ya me hemûyan e. Divê ev kovar bigihê destê her însanekî me. Hêvî û daxwazeka me ya din jî we heye: Em dixwazî di her hejmareke kovarê de, jî cil û bergên kurdên Anatolîya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de bîweşînin. Eger li ba we wêneyên kesên jî malbatên we, çî jîn û çî mêr, bi kinc û tevgîrêdanên kurdî, li ba we hebî, jî kerema xwe ji me re kopiyekê bişeynî. Bi vê yekê em ê bi dewlemendiya tevgîrêdana xwe bizanî û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin. Ne tenê ew eger serpêhatiyek, çîrokek an jî kilameka folklorîk li ba we hebe, bi nivîs an jî bi deng jî kovarê re bişeynî.

Bîrnebûn kovara we giştîkan e, wê bi tenê nehilî!

Careka din mala we ava û her bijîn!

Ali Çiftçi

Li Salzburga bajarê Avusturyayê şahiya kurdên Aksarayê

Li bajarê Salzburga Avusturyayê kurdên Ekeçika Aksarayê cara yekem şahiya çandê li dar xistin. Şahiya ku gelek kes beşdar bûn bi çoşeke mezin hat li dar ket.

Şahiya kurdên Aksarayê di salona çandê ya Tribuhneyê pêk hat. Şahî bi axaftina şampiyonê boksê yê Ewropayê Engîn Erdogan ve dest pê kir. Piştî axaftina Erdogan qurana pîroz hat xwendin. Li ser navê komîteya amadekariyê



Dîmenek ji govenda keç û jinên kurdên Aksarayê li Salzburga Avusturyayê.



Dimenek ji govenda keç û xortên kurdên Aksarayê li Salzburga Avusturyayê.

Ozgur Çankaya axaftinek kir û anî ziman ku mebesta lidarxistina şahiya çandê ew e ku nirxên xwe yên çandê biparêzin û ji bo nîfşên nû bihêlin.

Ozgur Çankaya di axaftina xwe de behsa dîroka kurdên Ekeçika Aksarayê kir û anî ziman ku polîtîkaya asîmîlasyon û înkare polîtîkayeke dewletê ye û wiha axivî: “Em zîhniyeta ku partiya me DTP’ê digirin şermezar dikin. Ger îro em bi rihetî bikaribin xwe îfade bikin, em vêya deydarê Tevgera azadiya kurdan in.” Piştî axaftinan der barê şehîde tevgera azadiyê Zinar Andok (Îbrahîm Kiliç) ku kurdê Aksarayê ye sînevîzyonek hat nîşandan.

Pişt re peyama ku Wezîrê Entegrasyonê ya Eyaleta Salzburgê, Anja Hagenaur hat xwendin. Hagenaur di pey-

ama xwe di diyar kir ku şahiyên çandî yên bi vî rengî girîng in û divê dewama vê şahiyê pêk bê.

Her wiha peyamên serokê Komeleya Çanda Ekeçik ya Holandayê Seyît Keskîn û peyama Ozan Zinar ku kurdê Aksarayê ye li Amsterdamê de tedavîyê dibîne hat xwendin.

Di şahiyê de helbestavanên kurdên Aksarayê, Remê Hilkeçikê, Ozgur Çankaya, Yeter Akin û Nazmî Kavas helbest xwendin. Ozan Delîl Xidir û Koma Dem ku di bin banê Komeleya Çanda Mezopotamyayê ya Linzê xebatên xwe dimeşîne stran gotin. Şahî bi govendan ve bi dawî bû.

ÖMER YÜCE - SALZBURG

Rengên ji Kurdistanê

Defîleyek li ser kinc û bergên jinên kurd Hevpeyvîn li ser defîleya kinc û bergên jinên kurd

bi xanim Inci Hakbilenê re

Armanç û xebatên defîleyê çi bûn?

Herkes di civata xwe de gor pîşeya (meslekê) xwe xebatên çandî û hunerî pêk tîne. Dizayn karê min e. Min jî xwest di warî modeyê da cil û bergên kurdistanî bi reng û ahenga wî ji nû ve têkim rojeva jiyana civakî ya rojane, ji bo ku hin hêjayiyên, dê û dapîran, bav û kalan bigihîje asta jiyana jinên kurd. Ez dixwazim bi kurdî modeya xas a kurdî li cîhanê bidim naskirin û jiyandin. Bi vê gava yekem wê gelek kesên modezan/modekar cûrretê vê xebatê bikin.

Desen û motifên kincên jinên kurd pîr in, ma defîleyekê têra we kir?

Ez bi defîleyekê tenê têr nebûm û nabim jî. Ji ber vê yekê jî daxwaza min a herî mezin ew e ku ez her sal defîleyeke nû li Awrupa û welat li dar bixim û pêşkêşî raya giştî bikim, li bajarên qedîm, Amedê, Silimanîyê û... hwd. Cil û bergên civatan (gelan) perçeyek ji nasnameya wan e. Ev nasname, wan gelan bi reng, motif û helwesta xwe ji civatên din cûda dike û ev cûdatî jî serbixwetîya çand û hunera civatan bi xwe ye.

Tesîra kincên dora Haymana û herêmên din yê gundên kurdan li Anatolîya Navîn kîjan rol di xebatê we da leyîst?



Di zaroktiya min de ez bi kincên dapîra xwe, xaltî û metên xwe gelek kêfxweş bûm. Dema min dest bi dibistana keçan ya dîzaynê kir, min dixwest ku ez rojekê kincên dapîra xwe û kincên jinên kurdên Anatoliya Navîn bidirûm û wan klasîk û nûdem dîzayn bikim, ji ber ku ev cil û berg bi rengên xwe yê pîroz perçeyek ji jîyana min bûn. Guliyên porên wan yê bi berg hatibûn xemilandin jî gelek li cilên wan dihatin û ez dibûm heyranê kombînasyona wan. Ev sûret wek xeyaleke mezin di dil û mejiyê min de cîhekî daîmî û biwate girtibûn ku diviya bihata pêkhatin. Her ku hestên min ên neteweyî pêş ve diçûn û haya min ji min û bingeha min çêdibû, ev daxwaz jî di dilê min de girtir dibû.

Kîjan şert û astengî li ber we hebûn?

Tu şertên min yê ku ez vê defîleyê li dar bixim, nebûn. Lê belê daxwazên min hebûn, xeyala min a ku dixwest pêkwere hebû. Bi

taybetî li Awrupayê piyeseya modeya kurdî, mînakên kincan nebûn û hîn jî nînin, yan jî ez bêjim, gelek kêmin. Cawên kincên kurdî nedihatî dîtîn û kirîn. Min gelek perçeyên kincan ji Kurdistanê da anîn. Lê mixabin li wir jî ev adet li ber têkçûnê ye. Di warên aborî, pîlansazî û pêkanîna defileyê da gelek alîkariya hevalên min bûn. Mînak: hemû modelên min nû bûn û lb hesteke amatorî ji dil û can bi min re bûn û wan ez bi tenê nehîştim. Ew her hebin. Gelek spasîyên wan dikim.

Çiqas wext xebatên amadeyî girtin?

Heger ez dema xeyalên xwe ji li ser xebatan bihesibînim, demeke dûr û dirêj ji bo amadekariyê hewce bû. Lê belê xebatên dirûn û pêşwazîkirinê bi giştî şeş mehan dom kirin.

Alîkariya kesên çawabû? We pêşgiriya sazgeh û kesên xwest û çawa bû?

Ji rêxistin û komeleyên kurdistanî alîkariyek, piştgiriyek hestî û aborî hîç nebû. Lê belê heval û dostên min ên kurd û yên din wek qadroyekê bi min re bê heq kar kirin û gelek ji wan kesên ehlê karê (pîşeyê) xwe ne. Mînak: di warê teknîk, ronahî, musîk, çîh, reklam, pêşwaziyê de kêmin û zêde 40 kes destek dan min û her yek di warê zanyariya xwe da bê lamûcum çalak bûn. Herçiqas keça min, Dicle, li Hamburg çêbûye jî, hestên wê yên li ser bingeha xwe, ez bi tenê nehîştim û hebûna wê bi xebatên çalak ji min re jî bûn motivasyoneke mezin. Ji wê

re spasîyên xwe dikim. Ji komel û rêxistinên kurdistanî bi hêvî me ku xebatên ji bo civata kurdî di warê sîvil û siyasî de bi tenê nehêlin û bi hestên civata kurdayetiyê li hêjayiyên me zêde bikin, xweyî derkevin û piştgiriya me bikin. Dîvê herkes di beşa xwe de xebatan bike û alîkariya xebatên beşên din jî îhmal neke.

Di çapemeniyê da nû?e û şîrove derketin û bûn dikarin behsa we bikin?

Di çapemeniya tirkî, kurdan û almanan de li ser defileyê kurdî bi navê „Rengên Mezopotamyayê“ nûçe û şîrove derketin. Ev nûçe û şîrove gelek balkêş bûn. Rojnameya Ozgur Politikayê bi hest û rengên kurdewarî du caran berê defileyê û piştê wê, nûçeyên pîr xweşik weşand. Ez bi wan pîr serfiraz im. Rojnameyên tirkî jî nûçeyên xwe, herçiqas min berê bala wan li ser kurdistanî û kurdbûna defileyê kişandibû jî, wan dîsa nûçeyên xwe, xeynî rojnameya Post, li ser defileyek ji cil û bergên başûrê rojhelata Tirkîyê weşandin. Ev weşan hinek di warê morovatiya mirovan û çapemeniyê de ez êşandim, ji ber ku min wek min nedan û nadin nasîn.

Di televziyona dewleta Alman, NDR de jî nûçeyek li ser amadekariya defileyê û pîşwaziya wê hat weşandin. Di ber ra jî kurdên Hamburgê hatin nasandin û behsa rewşa defileyê kurdan û yekemînûna vê defileyê hate ziman. Ji bo kurdan û bi taybetî jî kurdên Hamburgê îmajek baş hat pêşkêşkirin.

Defile gihîst armanca xwe?

Ji bo min û beşdarên defileyê gelek xweş û serkeftî derbas bû. Min xwe gelek baş ji bo vê defileya yekemîn li Hamburgê amade kiribû. Di çapemeniyê de gelek cihên xweş girt. Lê belê xemgîniyek mezin ew e ku televîzyonên kurd ku hêjmarên wan ne kêman, beşdarî defileyê nebûn û bername yan jî nûçe di vê çarçovê de neweşandin, herçiqas me ew vexwendibû jî. Hêviya min ew bû ku TVyên kurd li gel TVya Alman NDR ji bo kurd û Kurdistanê nûçe çêbikirana û defiley bi giştî biweşanda.

Çi plan û hewldanên we ji bo dema pêş hene?

Ez bi hêvî me ku TV defileya yekem ji bandê ji bo pêşketina xebat, motivasyon û agahdariya gel di vî derheqê de biweşînin. Defileya min ya diduyan wê bi koleksiyoneke nû di 26 û 27ê Sibata 2010an de pêşwazî gel li Hamburg bibe. Hemû têkildar û medyaya kurdî ji dil û can vedixwînim beşdarbûn û weşandina nûçeyan. Di vê defileyê de jî ez ê cil û bergên kurdî yê klasîk û nûdem pêşkêş bikim. Defileya min armanca modeya kurdî li ser bingeha civata kurdan ya kevnare ye, ne folklorîk e. Hêviya min ew e ku ev cil rojane jî werin lixwekirin. Xebatên min ev jî xwe ra kiriye armanc. Modeyek kurdî ya nûdem li ser esasên şaristanî ji bo keç, bûk û dayîkan e. Bi taybetî xeyalek min jî ew e ku ez van defileyên di rojên pêş de li bajarên qedîm Amed, Silêmanî, Hewlêr û Mêrdînê pêşkêşî jinên kurd bikim, ji ber ku jinên kurd layîqê tiştên gelek xweş in û ev defile

bi rastî jî gelek xweşik bû. Ez bi hêvî me ku di demek kin de aloziyên siyasî çareser bin, lê ew hebin jî, em ê defileyên li bajarên qedîm taloq nekin.

Şert û derfetên ku defile li Kurdistanê bê pêşkeşkirin çawa ne?

Ez kurdek li dîyasporayê me û têkiliyên min ên kesane û rêxistinî li Kurdistanê xemgînim ku tunene. Lê belê ez hewl didim ku bi şehredariyên kurd re têkiliyan di vê çarçovê de daynim û bi xebatên ji bo wan bajarên jorîn dest bikim. Ji bo defileyeke li Amedê amadekariyek hebû, lê belê ji ber van êrişên dawî li ser şehredariyên kurdan ev xebat hat taloqkirin, betal nebû. Heger saziyên kurd û Kurdistanê daxwaz bikin, em ê bi qadroya xwe bi coşek mezin li welatê xwe bi serfiraziyek mezin gelek defileyên pêşkêşî kurdistanîyên hêja û şareza bikin.

Tiştê ku herî zêde tu bi heyecan kir, çi bû?

Dema ku mirov bi dîrokî li pêvajova jiyana Kurdistanê mêze dike, diviya hemû kurd reş girêbidana, cil û bergê wan, yê şînê bûyana. Lê çi xweş e ku em civatek xweş jiyân in, cil û bergên me reng û reng in. Her reng bi wateyek xwe ya xwezayî, olî, civaka sosyalî kêfxweşî û hurmetê simbolîze dike. Gotina; „Em zarokên agir û rojê ne, ji xweliya agir ji nû ve jîndar dibin“ civata me ya jiyanez, bi motîv û rengên me, bi berxwedana jinên me gelek qenc û xweş tîne ziman.

Amadekar: Sami Ekici,

Mamosteyê zimanê Kurdî, Hamburg

Destpêka axaftinê û fonksiyonên ziman

Prof. Dr. İlhan Kizilhan

Belê ziman pêwîst e. Lê kî ji me di jiyana rojane de li ser difikire, em çima dengdayan, bi zimanekî rast xwedî syntaks diaxîfin. Axaftina otomatîk û rast zarok çawa hîn dibin? Zimanê me yê organîk wek ji ber xwe ve dest pê dike û diaxîfe. Elementên biyolojî, civakî, nevrolojî û psîkolojîyê bi hev re ev zimanê ku em pê dixafin gengaze dike. Heta mirov bêjeyekê derdixe, bi hezaran hucrên organîk û nevrojî di nav hinek mîkrosaniyan de kar dikin û wiha mirov bêjeyekê dibêje. Ku yek element kêm be, an jî baş kar neke, asteng di axaftina ziman de derdikevin.



Ji aliyên jenetîka mirovan enformasyon li ser ziman û axaftina ziman ya rast di mejû de bi çêbûna ji dayikbûnê de tê afrandin.


Ziman ne tenê ziman e

Heta mirovek bikaribe biaxîfe gelek fonksiyon divên werin bi kar anin. Di grafîka 1 de, tê diyarkirin ku ziman ji gelek babetan digihîje hev û wiha ziman dibe xwedî şikil

û formeke efsûnî daku mirov ji mirov fêr bike.

Zarok û axaftin

Ferbûna ziman beriya ku zarok were



Grafîk 1: Babetên ku ziman li ser hatiye avakirin

dinyayê dest pê dike. Di zikê dayika xwe de guhdariya axaftin û dangan dike. Hinek hefteyên piştî ku zarok tê dinyayê, dest pê dike bi girî û herz xwestinê xwe tîne ziman. Herwiha ragihandinek di nav dayik û zarok de beriya axaftinê çêdibe. Dayik û zarok pir dangan di navbera hev de dikin ku mirov bawer dike ew bi hev re diaxifin.

Ragihandina sembolîk ya yekemîn piştî şeş mehan dest pê dike. Ev bi girî, an jî bi livbaziyan wek livandin xwestinên xwe diyar dike. Bi wê ragihandina sembolîk zarok ziman wek aletekî bi kar tîne. Ku zarokên piçûk bixwazin werin hemezkerin, ew destê xwe dirêj dikin ku mezin dikenin, ew zarok jî dest pê dikin û dikenin, ew wiha bala mezinan dikîşînin ser xwe û dibin perçeyekî ragihandina kolektîf.

Li dora neh mehan zarok dest pê dikin û diken qêrîn daku tiştêkî bi za-

nebûn bistînin. Bi girî hedef nîşan didin daku bighîjin armancên xwe. Ku dîtin û awirên xwe li ser tiştêkî konsentre kiribin, ew destê xwe nîşanî wê hedefê dikin. Ku hedef ne li ber çavan be, divê mirovên mezin bi xwe derxînin ku zarok çî dixwazin. Ku mirov tiştêkî xelet diyarî wan bikin, ew dengê qêrîna xwe bilindtir dikin.

Piştî hinek mehan zarok jî bo tiştêkî bixazin bi sembolîk diaxifin. Ango zarok bi neh mehan jî aliyê zanistiya ziman dixafin. Mînak: Ku zarokek birçî be, dibêje: *namnam*, an jî *hamham* û hwd. Namnam wiha dibe cigirê „*Ez birçî me û xwarinê dixwazim.*“ Dayik an jî bav têdigîhîjin û xwestina wî zarokî bi cih tînin. Piştî gihîştina wê derecê zarok dereceya heywanan derbas dikin, ji ber ku xwestin û hedefên xwe bi hizrandinê nîşan dikin. Ev destpêka ragihandineke aktif ya zarokan e.

Piştî salekê zarok ji pirsan jî têdigi-hîje. Ku mirov ji zarokên biçûk bipirse “Ka çavê te?” Ew bi destê xwe çavê xwe diyar dike û hwd.

Pêşi bêje û piştire axaftin

Beriya ku zarokên biçûk fêrî bêjeyan dibin, ew dest bi axaftinê dikin. Car caran jî wek mezinan devê xwe dibin û tînin, dixwazin wek mezinan dangan derxînin. Beriya ku biaxifin, zarok dibin xwedî gelek bêjeyan, wan fêrî dikin lê nikarin bibêjin. Mînak: Ku mirov bibêje hesp, ev hespê diyar dike û dibêje; *hîhî*, nabêje hesp.

- Struktura ferbûna ziman li gel zarokan
- Hiraşî û sazûmanîya hevokan heye.
- Struktura kûr û ser rû heye. Struktura kûr li ser wateyê radiweste. Herdu struktur bi şertên transformasyonê digihîjin hev.
- Ziman dikare bê dawî hevokan biguhirîne û dikare herdem hevokên nû biafrîne.
- Daku zarok bikaribin fêrî zimanekî bibin, divê wateya ziman fêr bibin. Pêşi struktur û rêziman ne pewist e.

Ev hinek mînakên jor diyar dikin ku prensîpêkî girîng heye:

Zarok ne tenê fêrî axaftinê, bêjeyan û gotinan dibin, ew herwiha fêr dibin ku her bêjeyek xwedî livandin (hareket) û wateyê ye. Ev hemû jî prensîpên zimannasiya lînguîstîk in.

Di têgihîştina dinyayê de ziman rîstekî mezin dileyize.

Zarok bi kurtkirina bêjeyan û kopîkirinê zimanê mezinan fêr dibin. Herwiha zarok di salên pêşi de zêde dixwezin naveroka bêjeyan fêr bikin.

Mînak: „Dayê, mal e, em herin.“ Mezin jî, ku zarok bêjeyan şaş bibêjin (wek *min* û *ez*) rast dikin, heta wan bêjeyan rast fêr bibin. Ziman çiqas jî hev cuda bin jî, dixwazin wateya pêwendî û têgihîştinê were amedekirin, ango mirov ji hev fêr bikin û bi hev re têkevin nav pêwendîyan. Beriya ku zarok fêrî rêziman bibin, ew stratejiyên têgihîştin û wateyê bi kar tînin.

Armanca zarokan herdem têgihîştin e. Ji ber xwe ve û hêdî hêdî fêrî rêziman dibin. Di destpêkê de zarok ji aliyê mejû xwedî kapasîteyê mezin in û zû enformasyonan digirên. Lewra jî, zarok dikarin pir zimanan bi hev re fêr bibin. Lê her ziman divê serrast were fêrkirin. Ku du an sê ziman tevlihev werin axaftin, di mejûyê zarokan de struktur baş nayê bicîhkirin. Mînak: Ku zarok ji aliyê bav fêrî kurdî bibe, divê ev bav gotin û bêjeyên kurdî û tirkî tevlihev neke.

Ziman û civak

Zimanê gel, komek an jî netewek çiqas dewlemend û pêşketî be jî ku nejî, nikare ji bo pêşerojê bibe zimanê

zarokan, ango nesîlên nû. Ziman divê bijî, ango di her xala jiyana gel de divê ziman bibe bingeha ragihandinê û pêwendiyê. Ku bi zimanê zikmakî em bi hev re li ser raman, çand, civak, aborî û hwd. neaxifin, ku em kul û derdên xwe, xewnên xwe bi hev re parve nekin, ziman nikare bijî. Tenê ku hinek rewşenbîr, nivîskar, komeke biçûk bi zimanê zikmakî biaxifin, ev têr nake.

Iro ku civaka kurd bi hemû sazî, rêxistin û komelên xwe ve bi rastî bixwazin dîsa vegerin ser zimanê xwe, divê ev di karmendî û teoriyê de bernamêyên xwe biguherînin. Bi taybetî mirovên nas, ango serokên rêxistinan, siyasetmedar, hunermend, nivîskar û hwd. divê gavên pêşî biavêjin û bi fermî bi zimanê kurdî biaxifin. Mînak (idol) ji bo gel û taybetî ji bo zarok û ciwanan pir giring in.

Daku were tégihîştin ku zimanê zikmakî ji bo civatekê çiqas giring e, ez ê hinek xalan pêşkeş bikim.

Giringiya tégihîştina zimanê zikmakî ji bo civatekê

Ziman di pêşveçûna nasnameyê de (identity) rista herî mezin dileyize.

Ziman dibe bingeha nasnameya zarokekî û şexsîtiya wî.

- Bi zimanê zikmakî zarok fêr dibe ku jiyana xwe û cihanê nas bike û têbigihîje.

- Ziman rê diyarî zarokekî dike daku karibe li ser piyên xwe di pêşerojê de raweste.
- Zarok tenê bi zimanê zikmakî ne fêrî tiştan dibe, ew herwiha dikare binirxîne û biafrîne.
- Zarok bi zimanê xwe dikare bi mirovên din re têkeve nav ragihandin û pêwendiyên.

Mîras û xezîna civakê: ziman

Herwiha zarok bi zimanê bav û kalan dibe endamê civakekê û civaka xwe bi serbilindî, şahî û şerefeke mezin dinirxîne û lê xwedî derdikeve. Yek ji sedemên ku car caran pir ciwan li nasnameyên xwe xwedî dernakevin, ew nasnameya xwe negatîf şirove dikin ku zimanê zikmakî baş nizanibin, xwe ji vê nasnameyê (çand, edebiyat û pêwendî bi civaka xwe re û hwd) dûr dixin.

Nasname ji bo parastina dîroka şexsî û koma wî risteke mezin dileyize. Ev jî hinek girêdayîyê ziman e.

Ziman jiyana dîrokî ya kolektîf, çand û mejûyê kolektîf diparêze û dide nesîlên nû. Bîrbûna civakî ya dîrokî bi zimanê zikmakî tê parastin. Dîroka her mirovekî ya şexsî û netewî perçeyekî jiyana wî ya paşerojê ye. Dîrokeke kolektîf ya rast û bingehî bi zimanê wî tê naskirin. Bi zimanê zikmakî zarokek di nav civaka xwe de tê pejirandin,

çand û dîroka kolektîf fêr dibe û wê mîrasê di paşerojê de dide zarokên xwe. Zarokek ku zimanê dayika xwe di zarokaniya xwe de fêr nebe, di paşerojê de ew pir astengiyên dibîne, ew ji aliyê civaka xwe û civakên din jî belkî her dem biyanî dimîne. Mirovekî ku nikaribe rast û bi babeteke têgîhîştî bi zimanê xwe biaxife, ew ê herdem kêmayiyekê di xwe de bibîne. Lewra jî axaftina zimanê zikmakî bingehê herî

mezin e ji bo tenderûstiya civakêkê.

Mesela zimanê kurdî îro ne tenê meseleya zimanekî ye an jî guftûgoyeke teoriyê ye. Hebûn û tunebûna zimanê kurdî hebûn û tunebûna hemû nîrxên kurdan yê kolektîf e.

Tradejiyên mezin hatine serê kurdan. Ku kurd nexwazin giyan, rih û nîrxên wî milletî bimire an jî were perçekirin, divê ev li ser zimanê xwe rawestin û biaxifin daku ziman bijî!



Prof. Dr. İlhan Kizilhan li zanîngeha Konstanz û Freiburgê di warê lêkolînên pevçûn û aştîyê de dixebite. Heta niha Kizilhan 11 pirtûk nivîsandine û zêdeyî 110 lêkolînên orjînal di kovarên navnetewî yê zanistî de weşandine.

ilhankizilhan@t-online.de

Literatûr:

- N. Chomsky, *Sprache und Geist*, Ffm 1973
 J.J. Katz, *Philosophie der Sprache*, Ffm 1969
 N. Chomsky, *Reflexionen über die Sprache*, Ffm 1977
 B.L. Whorf, *Sprache, Denken, Wirklichkeit*, Reinbek 1963
 Kizilhan, I., *Der Sturz nach oben. Kurden in Deutschland*, Frankfurt 1995
 Kizilhan, I., *Kurdisch einfach lernen*, Berlin (1996), St. Georgen (2001)
 Kizilhan, J. (2004). *Sozialisation im Krieg. In Sommer und Fuchs* (ed.). *Handbuch der Kriegs- und Friedenspsychologie*. Weinheim: Beltz Verlag (S. 357-368).
 Kizilhan, I. (2005). *Biographiearbeit für Kinder und Jugendliche mit Migrationsintergrund*. In: *Forum Erziehungshilfen 2/2005*, Weinheim: Juventa Verlag (S.140-143).
 Kizilhan, I. (2008). *Die Gegenwärtigkeit der Vergangenheit. Funktionen des Erinnerns von außergewöhnlichen Ereignissen im Kontext der Gegenwart*. Berlin: Regener Verlag (440 S., in Druck)
 Wolfgang Köhler: *Zur Psychologie des Schimpansen*, in: *Psychologische Forschung*, Berlin/Göttingen/Heidelberg 1922, Bd. 1
 R.M. Yerkes: *The mental life of monkeys and apes*, in: *Behav. Monogr.*, NY/London/Paris/Leipzig 1916, Bd. 1
 Yerkes R. M. und Learned, B.W.: *Chimpanzee Intelligence and its vocal expressions*, Baltimore 1925

Reva me ya Stembulê SEWA XEYALA ARTÎSTÎYÊ

Nuh Ateş

Çel û pênc sal di ber vê, ez li bajarê Konyayê diçûm lîseya ticaretê. Ji mektebê sar bûbûm, qet dilê min nedixwazt ku xwe bi ser dim. Guhê xwe bi tîngnî ke, hemsalê min, Memê Hemê jî diçû Lîseyê. Em hemgundîyê hev bûn û hevaltîyêke me yê tîr hebû. Ew jî mîna min ji xwandinê sar bûbû. Me kiribû sêrî ku em ê xwandinê cibihîlin û herin Stembulê û bibin artîst.

Me ji sînemayê pir hez dikir. Perên me hendik bûn. Me ji qirika xwe dieşand, lê sewa sinemayê em ê destfere bûn. Me dunê nedibû û ji gundê xwe û ji gund û bajarên nêzikî wî tu der nas nedikirin. Film ji me ra derîyê dunyake nû vedikir. Dunyeka modern, rengîn û zengîn. Lewma em aşîqe filman bûn û bûn hesretkêşê jîyana di filman da. Stembul hîngê bajarê filman bû. Mîna pir kesan, me jî berê xwe da Stembulê.

Me îna dikir ku em ê bibin artîst.

Pozê me li ewra digeriya. Çavê me î li rola seraktor bû. Bi rolên ji seraktor berjêr em nedihatîn ser. Em her du jî heweskarê spora kereteyê bûn û me kursa wê xetim kiribû. Lewma me ji xwebixwe ra digot, ku em neçar man, qet nebe em ê bibin dublor. Ku ew jî nebû, em ê dêst biavên tucariya seyar, cincik û mincika bifroşin.

Bi van xeyal û omdîyan me mekteb cihîşt û xwe ji nas û hevalan vedizî û revîyan çûn Stembula xopan. Xalê Memê, Hesênê Fatê Mîmê li Stembulê dijîya, me xwe li wî girtibû. Dê û bavên me li gund bûn û hay ji çûyîna me ya Stembulê sewa xeyala artîstîyê tune bûn. Tenê hevalekî me bi plana me ya çûyîna Stembolê dizanî. Ew jî Hesê Hewê bû. Di navbera me û wî ra av derbas nedibû. Li gorê plana me, ku em li Stembulê bi şûn û war bûn, hîngê Hesê Hewê jî ê bihata cem me. Lewma jî xwaşî û talîyên rev û rêvîtiya me ya Stembulê neketin para Hesê.

Em qedera du mehan li Stembulê man û vir da û wê da gerîyan lê me tu avil nekir. Di vê navberê da, malbatên me pê hêsîyan ku em ê li Stembulê ne. Wan zor dan ser xalê Memê û ew sudar kirin. Li ser paşiyê, em mecbûr man şûn da vegerîyan û hatin ser xwandina xwe.

Em bi otebusê ji Stembulê vegerîyan Konyayê û li hêlê Girê Eledîn peya bûn. Bavê Memê, Hemê Hecî Elê û birayê min, Saliyê Hecê hatibûn derîya me. Bi hev ra em helkişîyan serê Girê Eledîn û li ser qenepeyekê rûniştin. Ez û Mem ji fedîyan ra di herdê ra diçûn xwarê û me li rûyên Hemê û Sêlî mêz nedikir.

Tenê Hemê deng dikir. Wî got, "a rind e ku hun vegerîyan. Em bibên, dused û sêsed qaymeyên we hebû û we ew ê mehek-dumehan herc bikira, lê paşê wê çir bikira!? We caketên xwe bifroştana û we yê bi perên wan jî heftekî-duhefteyan îdareya xwe bikira, lê paşê!? Paşê jî we canê xwe bifrošta!....."

Me serî kiribû ber xwe û deng ji me dernediket. Kenegîriyekê bi me girt, lê me bi hundurê xwe da ber dida.

Bi çûyîna ne, lê bi vegerîna ji Stembulê em pir bi ber xwe ketin. Wexta ku em li tetîla havînê çûn gundê xwe, xelk li me rabû sêrê. Kesekî

ku qîrfê xwe bi me nekirî nema. Em bûn rûswa! Ji yên ku raste me dihatin, hena tu dikire serçavên me. Hena jî şîret û lome bi ser me da dibarandin. Ji gîştkan pirtir yên ku kurikên xwe li bajêr dixwandin li me didan. Ew ditirsîyan ku em ê ji kurikên wan ra bibin nimuneyên neçê.

Reva me ya Stembulê ber tu tiştî negirt. Xwazteka me ya artistîyê neçû serî. Artistîyê berde, me heheleya karên sînemayê, "Yeşilçam" bilem nedît. Tucariya seyar ji bi dest me neket. Dublorî jî nekete para me.

Dublör peyveke filmî ye. Ji şûngerê (cigir) artîstan ra dublör tê gotin. Egîten filman carnan ji bo rolên bi taluke yan jî sehneyên zedê seksî ji xwe ra dublora radigrin. Dublörî hunerkarîyeke bi meşeqet e û jê ra wêrekî û profesyonelî gerek e.

Meriv dikane bi kurdî şûna dublör şûnger bikar bîne. Di kurmancîya Anatolîyê da li hen deran peyva "cigir" tûne. Şûna wê şûnger heye. Zemanê berê şivanekî, wexta ku dixwazt rojeke li mal bimê û bi gotina hîngê, kincê xwe biguhêre, şûna xwe merivek dişand ber pêz. Ji wi ra digotin "şûnger". Bi gotineke din, şivên ji xwe ra dublör radigirt. Ji bo vî karî wî pere dida şûnger yan jî şîranîyên wekî şekirê bena, benê kêndirê û şekîr û fîstiq jê ra distand.

Ji yên bê tecrube ra şûngerî ne karekî hêsan bû. Ez bixwe jî çend cara bûma şûngerê şivanan û min serhatîyeke bi tirs jî derbas kir. Ez î pandeh û şanzdeh salî bûm û ji ber şivanekî va çûm ber pêz. Yanê bûm şûngerê wî. Kerîyên pêz yên mezin tim du şivanên li ber wûn. Şivanê ku ez ji ber va herim ber pêz temênên xwe li min kirin û ji min ra cihê ku pez lê diçêrîya helda.

Ez li kerê sîwar bûm û min dev da rêya ku min bigihîne herda pêz. Lê ez dereng mam û hîn ku nehîştibûm herda pêz tarî ji niçkava ketibû herde û mîna ku dibên, çav çava nedîtin. Min xwe li dengê rîngnîya zengilên stûye pêz û fitefita şivên û lêketina kuçikên wî digirt.

Gerek bû ku ez di Newala Pîrikê ra derbas bûma. Newaleke kur bû. Li gorê katkirina çêrokî di vê newalê da "pîra merxurî" dijîya. Heşê hîngê bûn, wekî pir kesan min jî bi vê çêrokê îna dikir. Çare tune bû, min çûyê kerê kir

û ez daketim newalê, lêbilem xofekê girte min û dil li min qetîya. Li binîyê newalê, li her du hêlên rêyê qeratiyên mezin û gewrkirî ji min va xay dikirin. Wan figurên çêrokan yên bi xof dianîn bîra min. Hetanî ku ez ji newalê derketim û gihêştim herda pêz hal di min da nema, beden li min sar bû, mîna ku dibên, ruh ji min kişiyabû.

Welhesil şûngerîya min mîna filmekî tiji qerequire û figurên çêrokî yên bi xof mîna dêvên heftserî û keftar bû. Dora dine rojê, li vegeîrîne min dît ku ew qeratiyên mezin û gewrkirî yên di newalê da kevirên xwêdanîyê bûn.

Bê bi çûyîna Stembulê çir bîkî, me nedîzanî, jîyan û serhatîyên me bi serî xwe filmek bû, filmekî rast.

Qet ser vemedin, ter ez î di şandeh salîya xwe da bûme dublor, lê min hay jê nebûye.

23.01.2010

ADORNO

"nach Auschwitz ein gedicht zu schreiben, ist barbarisch"*

adorno yê delal
ich verstehe dich wohl*
bûyêrên wî insanî ku
mêjoyî xwe li serî bûyê bela
û ve insanî ku mehkûmê tabiatê xwe
paşi neyê
tevde qirkirin îcade wî yê
û erbabê karên wisa yê
adorno yê delal

*ich habe meinen gott in auschwitz, babîj jar und in dersim verloren**
*meine engeln sind in halepce gestorben** adorno yê delal destûr bide
ez barî we zarokên Auschwitz, babij jar, Halepce, Sabra û Şatila û
Dersim ê yî giran gram û gram li tîpên peyvên şîrekê parve kim.

Seyfi Dogan

* Ji Auschwitz ê bi şun da helbest nivisandin hovîtîyê *ez te baş fehm dikim e

* Min xwedê xwe li Auschwitz, babij jar û li Dersîmê winda kir.

* Melekên min li halepcê mirin

RÊWÎ

Seyfi Doğan

Her carê ku ez herim îzinê diltengîyêke berî çend rojan dest pê dike û canî min kotîn dike. Diltengîya min her ku nezîkî wextê tetilê bûm a zêde bibe û rojê ku herim a bi navî cava gê.

Telaşe û endîşê.! Belkî heycana rêwîtiyê jî hebe lê ne hemî ye. Di sînoran re derbasbûyîn ne hêsa ye. Xofekê digre ser insên.

Her wextê ku ez tême sînorekî, gotinê Jean Jaquese Rousseau tê bîrê min: "Eger yekî, tujikê ku ji bo sînori mûlkîyête beli bikin, ji erdê derxista, îro had û hidûd nedibûn". Tabîî had û hidudên serîyan ê dom kirine.

Serî û doralîyên me tiji sînor kirin.

Yên ku îqtîdar kirine destên xwe bi me re dibêjin û nîşan didin û beyan dikin; Had û hudidên xwe bizanin. Ji sînoran derbas mebin! Xudîyê wê axê hene.

Guh bi ser fermanan din û sûyê xwe li ber xwar bikin û îtiad bikin! Ji bo xêrê xwe destên xwe mîna mehkûmekî li ber xwe girêdin!

Bi tirsê giyan û canî me teslîm heyni-

ne. Dixwazine ku em xwe suçdar hês bikin û dixwazine pisikolojîyê suçdariyê li her hucreke canî me bi şun bikin û birîşîn.

Dixwazine ku mejoyî me felc bikin û em şîyanê xwe yê fikirinê winda kin.

Tiştî nekolîne. Ji tiştî goman nekinî. Kiritik nenêrin.

Dixwazine piştê li me bişkênin û şexsîyêta me bi ax û xuli kin ji bo ku me wek hêvir bistirên Dengî xwe mekin. Xuya mekin! Pirsan mekin.! Dua bikin ku emî we çö nekinî û nekine hundir! Çavpêlîyê mekin! Kerselno!

Sînor têrê nekirin. Dîwar rakirin ser lîngan. Dîwarên bilind. Diwarên ku bajar û gund ji hevdû veqatandin.

Sinorên ku mayîn li navbarên dê û dotê raxistine. Insan pelçikandin. Welat parçe û parça kirin û nasnameyên însanan ji dest girtin û însan perîşan kirin.

Ji xwe dîne li ser însanan teng bûye. Însan klaustrofobîyê di jîyanê xwe ya rojane da dijîne. Bi ser da jî had û hidûd.

*

Li Stockholmê li balafire siwar bûm.

Kurmanc û tirk tevlihev bûn. Piranîyên rêwîyan ji Omera, Sefka, Xelika, Beşkardaşê (gundên kurdan) û yê ji Kuluyê bûn (Kulu qeza wan gundan e).

Bi hezaran însanên ji wan gundan û ji qezaya Kuluyê li Swêd dijîn.

Piranîyên xelkî Swêd, Kuluyê mina bajarakî Turkiyê mezin an jî wek navê Turkîyê yê din dizanin. Çimkî ji car însanên ku ji Turkîyê hatine Swêdê, sisê yên xwe yê ji derdorên Kuluyê hatine.

Neşeşorê direj nekim. Teyara bilind bû. Min kemera xwe vekir û nefeseke xwe ya kûr heyna. Ortalex kirvîckoyê. Jinan, zarokên li hembêzê û zendên bi bazingên zêrinî heta anişkê xemilandîne. Merê bi dengkirine ve mujûl bûn.

Min di nav wê teşqelê da whiskiya xwe got. Dîndarên zerduştî cing gûnehên û qelirên xwe bi êr pak dikin; min jî stres û endîşên xwe bi whiskyê şewitandin û pak kirin. Westiyabûm û raketim.

*

Teyare li ser susê kevî yê kanîyê jêri dêhat û rêwîyên Xelika dînan û ber ve sêfke firî.

Ez li faytonekê sîwar bûm û min ajovan nas nekir û wî jî ez nas nekirim. Ajovan ji min cîhê ku ez herim pirs kir û min cîhê ku ez herim tarifê kir. Li ber malê me pêya bûm. Rojeke germ bû. Roj mina sowê derî jev dişewitî. Li ber malê

me siri rustî ye û hemî xanî ji siri xuya nekê. Di navbare siriyan da derîyê malê bi heft zinciran kîlît kirine. Min xwest di navbara sirîyan re herim hundir, her derê min di bin xwînê (xwîdan) ve bû. Min şû nekir herim hundir. Li sîya malê gavekê runiştim û vehesîyam.

Rabûm berve dukanan çûm. Ketime hundirî dukanekê. Xwedanî xwe hevalê min î ji kundexê da ye û silava qutsî da. Xwedanî bi kirîyarekî ve mujûlî bû. Xayrî xwadanî dukanê çend kesên li ser kursîyan runiştine. Kesî silava min hey- nena.

Xwedanî dukanê karê xwe qedand bi şun da vejerî min û got: kerem ke hemşehrîm.

Min jê av û perçek çîkolatî xwe kirî û derketim derve û li ber dukanê li ser kursîyêkî runiştim.

Demekê runiştim. Min neynika xwe ji berîya xwe derxist û li xwe temaşe kir. Ez Sefoyê wek berê me lê rîyê min î dirêj bûne. Li kêlekî dukanê, binê xanîyê beledîyê da li ser kursîyê berber runiştim û min got, xwarzê rîyê apî xwe kûr ke.

Berber ji min pirsî xalo tu yî ji kîjan gundî yî?

Derketim derve.

Birçî me.

Li kevîya rê li aşxanekê bûm mêvan. Bihna xwarinan bi min nas nehatin. Min li lîsta xwarinan temaşe kir.

Xwarin neyê li gorê tama devî min bûn.
Derketim derva.

Koçe ralê bûkekê ye li ser rê terê.
Kincên wan însanan û muzîka ku min dibihîst, bi min pir xerîb dihat.

Rêz bi rêz insan dimeşîne. Çi tiştî kevin tê ber ê tixelînine û hildiweşînine. Lê li cîh ne xet û xeber ne jî nîşaneke û bîranînekê datînine. Dikenine û pi rîya xwe da berdewam dikine.

*Ji betonê xaniyên nujen ava kirine. Sar û sewr xuya dikirin. Pencerên xwe tune bûn. Min piraniyên wan xaniyan nas nekirin û kesî ku ez jê pirs bikim jî min nedî. Hemî hundirî xaniyan vala bûn û herim bi tîlen ceryan çerxkirî bûn.

Çend kalên li sîya qawekê runiştine gihiştikan jî nas dikime. Di ber re derbas bûm û min silav da lê ne xema kesî bû.

*

Teyare li Esenbogê daket û hemî ra- bûn ser xwe û bi lez tiştên xwe berhev- kirin.

Ji bo ku piçekî pêşta derkevin derve, bi lez bûn û pêla hevdu tinan. Li dawîyê ez dêhatim.

Herkî ku nêzikî xaniyê gumrikê di- bûn, insanên ku di teyarê da şên û skakrak bûn, dengên xwe giran kirin û wextê ku hatin ber devî derî xani- yê gumrikê bêdengîyekê temam orta-

lix heyna.

Li hundirî ku tolikên polisan teda, bi tenê dengê taqeraqê maresên polisan û dengê silahên ku li kalçê jinên polîs di- ket dihat. Dê û bavan kurik eşt dikirin û çî tawîz habûn didan zarokan ji bo ku deng nekin.

Însanan dixwast ku me xuya nekin, işî xwe zû biqedînin û derkevin derve.

Însanan xwe teslîm kiribû. Bes ji wê derê sax û saxlam derkevin. Wan rûyên xwe nedidan rûyên wazifeliyan.

Bi nasekî ve me li hevdu mes kir û bi hal û hereketên xwe xwest ku bibêjê: ji şerî wan xwe biparêzinî.

Hundirî xaniyê gumrikê tarî bû. Min li rêzên polisên ku pasaport kontrol dikirin temaşe dikir ku yekî rû nerm, rûken helbêjerim û di rêzê holikî wî kevim. Lê hemî wek hevdu bi miruz û bi sikûm bûn.

Çi dibe ma bibe, ez ketime dorekê. Wextê ku dora min hat, min silav da polîs û pasaporta xwe direjê kir. Wî sila- va min heynena û dûr û direj li pasapor- ta min mes kir û li komputerê henek tişt nivisandin bi şun da, pasaporta min da.

Fikirîm, nirxand û pîvand. Min pas- aporta xwe girt û derketim derve.

Roj dibiriqî û ezmanî hêşin bû.

Êzîzê mahcîr

Yusuf Yeşilöz

Navê min Êzîz e. Salên min heftûheft in. Daxwazek min tenê hebû ji zarokên min: ma ji xêra xwe miriyê min bibin gundê ku ez li mezin bûm. Ji bo ku ez naxwazim ruhê min li xeribiyê li nav biyaniyan şiar bibe.

Ez sî û sê sal in li Swissrê wek biyanî diminîm. Zaroktiya min li wîlayeta Konyayê di nav kurdan de derbas bû; bavê min li pişt herba cîhanê ya duyemîn ji gundekî li herêma Priştîna - Kosova hatîbû Anatoliyê. Li gundê kurdan laqaba min „mahcîr“ bû. Wexta ku ez diçûm bajarê Konyayê navê min „Azîzê Kurd bû“. Li fabrika tekstîla li Swissrê ji ez bûm „Azîzê Tirk.“

Em li gundê bavkalên xwe û li gundê Konyayê jî xizan bûn. Dema ku me nanê genim didît, qatix li me kêm dibû. Ji bo wê xopana xizaniyê bavê min ji gundê xwe derket, bû mahcîr. Xwedê rehmeta xwe bide wî, heta roja dest ji wê cîhanê berda, li ser gundê xwe digirîya; bi piranî jî wî li salên kal bûnê bîra hevalên xwe yên zaroktiyê dikir. Xizaniyê ez ji - bi tesîra bayêki şên - ji gund avêtim der. Ez îro jî bi tenê bîra çemê Însuyu ku em li kêleka wê diçûn neçîra qulinga, dikim.

Li piştî eskeriyê ez li nezîkî bajarê Zonguldakê di ocaxê komurê de dişuxilîm. Di rojeka bê êwr de xeberek bixêr hat ji min re. Gotin ku midûrek ji Swissrê hatiye ku ji Tirkiyê karkerên xort û bi hêz ji fabrika xwe re hilbijêre. Mezinan digotin: şans û bext carekê tenê li derî dixê. Min ji çend gundiyan kurd yên ku li Elmanyayê diman tiştên ewqes baş bihîstî bû ku ew mîna ku di nav rûn û hingiv de ajnê dikirin. Yek ji wana carekê hatibû serlêdana min; cilê wî nû, rûyê wî tijî û kurkirî bû, dilê mirov diket hal û cilên wî, çalîma wî jî mîna ya vezîrekî bû. Ez hingê çavteng bûm! Dema me bihîst ku qezenca me deh car zedetir dibe, qet manî li ber min nemabûn.

Min sibekê bi gogek sabûna kesk ku bîhna pûngê ji dihat rû û dest û pîyên xwe ya bi toza komurê rêş bûbûn, suştin. Hevalekî rûyê min kur kir, hevalekî din jî ji kincên xwe rengê şîn, ya ku pismamekî wî ji Elmanyayê diyarî wî kirîbû, li min kir. Mîna ku li ser ningekî min bazda ser qasa qamyonekê ku pê biçim Istenbulê. Hevalekî din bang min kir û got ku ez mîna zavayekî bûme. Ez bes keniyam.

Li ser rîya asphaltê bi kort li ser qasa qamyona BMC, ez berbi bextiyariyê ve diçûm.

Hingê digotin; kevir û axa Istenbulê ji zêr in. Wexta ku ez li ber xaniyê dai-reya kardînê ya bi du qata û bi rengê spî dawestîm, dilê min pît li diket, te bigota şeva hinê li ber mine. Heta ku cesaret hat min ku ez bikevim hundirê xênî, demek dirêj derbas bû. Te bigota qey ez qirara di navbara bihişt û cehenemê de didim. Wê demê min bes cixarek dixwest, lê memûrê zirav li ber derî got: „eger bîhna dû ji te bê, midûrê Swissî te nagirê. Wî ezbenî hindik qolonya li destên min kir û ez birim hundirê daîrê. Min jî xwe li ber diwar da rêza ku mîna tekmla eskêriyê rawestîbû. Midûrê Swissrê jî bi tenê li hember wana komak weraq û qelemek di destên wî de sekinîbû, li kêleka wî jî wergerê wî. Ode heta dêv tijî bû bi mêrên simbelrêş mîna rengên zeytûna û wan çavên xwe berdabûn midûr, te bigota li melekê Xwedê teala mêze dikin. Midûr li ber me çû û hat, li bejna me, li serê me û li junîyê me mêze kir; tê bigota ku qesebek li mihên serjêkirinê digere. Carina bi serê xwe tarîfêk dikir û wergerê wî bi qrawata şîn digot: “bira, tu dikarî herî mala xwe, Xwedê ji te razî be!”

Bi wî awayî di ser nivî re mêr derketin der. Em yên gir, bi gotina gundi-

yên kurda «wek kotek» di odê de man. Say ke midûr muhafizê sarokkomar hildibijêrî. Paşîngê midûr çû der ku çaya ku memûrê tirk ji wî re çêkiribû li odeyek tenha vexwe. Memûrê tirk hat cem me û bi ken got ku midûr niha bê û dixwaze ku bizanibe ka xwendin û nivisandina we heye yan na. Wî parçek ji rojnamê nîşanî me da û got ku ew bawer dike ku kesek ji me nikare bixwîne. Taxmîna wî rast bû. Naverok ji me re pispisand. Piştî çend deqîqan midûr kete hundir, ji ser masê rojname heyne û da dest zilamê li serî rêzê. Werger ji got: Oku!, bixwîne!

Camêr li rojnamê wusa bi çavên gir mêze kir, te ê bigota ew çav li dermaneki biyanî digerine. Lê memûrê tirk naverok ji me re gotibû, zilam ew ji dizanî. Wî dest bi xwendinê kir: «Li ser rêya navbera Ankarê û Sevasê penç kes çûn ser rehmetiya xwe. Postê şirketê li paytonekê xist, hesp û penç mirov mirin.» Bi rêzê de me ghiştikan ew xebera wusa rast xwend û midûrê Swissre mor li ser kaxizekê xist û ew da dest me. Min nikarî ji wî re spasiya xwe ji bêjim, ji bo zimanê min mina ku bi kendirê hatibû girêdan. Min bi tenê perê çorbayekê dan memûrê tirk yê ku xebera xêrê dabû me.

Heftekî bi şunda ez bi qîtarê hatim. Me dihesiband ev rêwitiya bihişt e, lê paşê, bi derengî wexta ku zar-

zeçên me hatin cem me û li wî welatê rojava mezin bûn, jiyana li me bû cehe-nem. Hevalên min li mizgeftê digotin: «Em ji ber baranê reviyana û toliyê em girtin!». Rast bû. Em ecêb man ku pereyên em herdem bi hesrata wan bûn, qet em bextiyar nekirin. Em bêhêvî bûn, ew êşek kûr bû!..

Li salên pêşî em li barakayên fabrîkê diman. Jiyana me erzan û xweş bû. Dawiya kar em li cîhê qahwê dihatin cem hev, hinan distiran, hinên din ji dileyîstin. Me gelek pere dan cem hev, me xwe ne bi mirovên Swisre, lewma bi gundiyan xwe qiyas dikir. Wexta ku me didît ku em ji axayê kurd li gundê me dewlementir in, kêfa me dihat û di govendê de xu li me diket.

Wexta ku zar û zeçên min hatin cem min, daxwaza min a dawî ji hat cîh; min keça xwe ya mezin, Meryem li lawê xwenga xwe, Hakan mar kir û anî Swisrê. Lê piştî çend mehan Meryema ku min bi diya pexamber navkirî bû ew xortê delalî mîna gogek zêr, mîna parçeyek herîr bi şûnda şand gundê me. Meryemê fediya xwe wenda kiribû li welatê kafiran.

Me hersal Hakan havînê li gund didî, xortekî dîndar û durist bû. Te ê bigota ew ji mala pexambera ye! Wî ne cixara dikşand, ne jî rakî vedixwar. Wî bi motorê ku min şandibû, axa gundekî diajot, jin û mêran qa-

la jîrbûna wî dikirin. Meryemê jî ji wî hez dikir, lê ne wek zilamê xwe. Me ji Hakan re bi zor û zahmet vîze derxistibû, min ji bo daweta wî komek pere veşand, lê qet ji destên min neêşîn. Roja ku keçika min diket mala xwedê roja min a herî baxtiyar bû. Min çavên xwe ji girtin, wexta ku min dît ku xort li daweta - ku nezîkî hefsed kes hatîbûn - nav bajarê Zurihê bîra vedixwin. Ez ewqes xoşdîtîni bûm. Xeyalên bavekî wekî din çi bibin? Min ji xwe re digot ku ez ê demek nezîk herim riya hîcazê. Kêfa min bêsinor bû, di dilê min da teyr difirîn.

Lê ew kêfa li min neçû. Xwedê ew rojên bextiyar zêde nekirin nesîbe min. Heftekî ji daweta me ya dengdar – ez hîn bi dayîna deynên ku me ji dawetê re kiribûn re mijûl bûm, xwerziyê min Hakan hat cem min. Wek her tim destên min maç kirin û li ser kursiya li keleka min rûnişt. Ev bi xwe de ketîbû, mîna ku te bigota tiştêkî xwe yî pirî muhîm wenda kiriye. Min texmîn kir ku xemgînîya wî bi Meryemê ve giredayî ye, lê min nikarîbû ku ez ji Hakanê delal bipirsim ka çi dilê wî dêşîne. Em demekê dirêj rûniştin - bêdeng wek masiyan.

Hakan rabû çû û min kurê xwe Memed şand cem Meryema bêfêdî. Memed ji Meryemê derxist ku ew li odeyek din radikeve. Bi tenê xwarina

Hakan çêdike û cilên wî jî jê re ûtî dike. Wexta ku min ew bihîst, te ê bigota ava kelî li serê min kirin, xwiziya min li ser zimanê min cêmidî. Û min Meryem da ber koteka. Ew cara yekem bû ku min li keçika xwe dixist, li min bi qar dihat, say ke bigota ez li roniyaya çavên xwe dixim. Meryemê tirs da min û got, “ez bangî polîs dikim!” Ew jî min re nedibû, ne li gora min bû...

Welhasil bi kurtî, dema min xiraw bû, mîna ku ez li vê dinê çûm cehenemê. Meryema dîn nikarîbû

carekê tenê jî be, ka ew çima ji Hakan hez nake. Wê me jî xwe teslîm şeytanê bê wicdan kirîbû. Min cara dawî jî alikariya Hakan kir; min bileta wî ya balafirê kirî û ew xortê delal zivirî gundê me. Ji wê rojê bi şunda min rîya gundê xwe nedît. Min bihîst ku navê min kirine “Ezîzê bi strû” Hevalên min li mizgefta Zurihê jî ez kirim Ezîzê bêdbext.

Ez herroj sed carî dimirim û êşa min min ya mehkûmekî ye.

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurmancên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê him bi tevgirêdana kurmancên Anatoliya Navîn bizanin, him jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr binin.

Redaksiyon

Aştîperweriya gelê kurd li ser dîroka gundî Bîrtalikê û Mistî Alê

Ekrem Harmanci

Sifteh ez dixwazim kêfxweşi li ser xebatên kurdên me yê Anatoliya Navîn ji bona qinyata çanda me dîyar bikim. Pîrsa min a pêşiyê, ka em hatin piştafinê yan jî me xwe li civatên din anî?

Na, tiştek ji van herduyan nîne! Me xwe gora dîroka Mezopotamya parastîye heta vê çaxê û tu cara çanda Mezopotamyayê jî ji bîr nekir. Em hertim dilsoz man.

Qedr û qîmetê me di lînerina çandî, civakî û dîrokî de hertim wekhev man.

Di berçavê diyardeyê de ku em civateka koçber in, binyadeke derûnî li ser dahûrîna parastina nîrxên civakî û nîrxan tevahî heye. Ji bona pir kurdên Kurdistanê ev bi qasî elawet û metheleka ku çawa civateka koçber heta vê çaxê piştî sed salan hîna haja nasnameya xwe bûye?

Bîrûbawerîya Charles Darwin li ser sazgêra parastinê dikane ji me re wek dahûrîn ev pîrsgirêkê amaje bike.

Belê, evîn û hesreta welat bi rastî mirovan sist dîke û ewqas jî sazgêra parastina nîrxên xwe û qedr û qîmetê xwe didane holê wekî xem û kulên dîlkî dikanin fikiran çikînîn. Bes tenêbûnê jî parastinê nîrxan di-hoyine. Ev nimûna hîna baş a kurdên Anatoliya navîn tê haylêbûnê.

tenêbûnê mîna dumanî reşe, nefesê li min girtiyê zevîyê xirab in gula baxceyê min î neruzitîyê hêvîyê min ê li ser te betal e û bîyê dilê ser bertîyê

Tîrs û xema ji ber tiştên nû û ber werin bîr kirinê, mirovan ber parastinê qedr û qi-

metê xwe dixîne.

Li sala 1992an ez ji welat hatim Elmaniya û rast ketim serbajarê dinyê Frankfurt. Min li vira dest bi zanîngê kir. Hesreta welat û civatê ez helandim roj bi roj. Hertim gava min mirovek didît, kî mirovek ji mirovatîyê min li gund dişiband, hundirê min dişewtî. Li vê çaxê min gelên indo-aryan nas kirin.

Ez bi xwe aşitîyê di nav gelên asyayê de pêşi dibînim. Yanî ez nabêjim ku gelên din aşitîyê nizanin û li ber xwe nadin ji bo aşitîyê. Feqet gelên indo-aryan li dîrokê de hevdu dişibînin Zêdetir talibên bihnfireh bi giştî ji nav gelên indo-aryan bûn, weki kurdan, farisan yan jî afganiyan.

Zêde vana mirovên ku nîrxên arîşen dadînin ber nîrxên daringî. Û ev jî hinek dibêjin ji destengîyê û belengazîyê tê.

Aştîperwerîya van gelan bi fikira min dîroka fêma van pevdigihîne. Vana zarokên ji malbatên ku ji ber cengê revî bûn, yan jî bona siyasetê ji welatên xwe dûrketî bûn. Dîroka vê fêmê ber her tiştekî li ser axa Mezopotamya disekîne. Niha ez diceribînim bûyîna vê fêmê li vê dewranê li ser dîroka gundî Birtalikê dahûrinim.

Li sala 1920an Mistî Alê ku mirovekî kêfdarê tûtînê ye, ji eşîra Omeran (Gundi Omeran- Tavsançali) vediqete û kerîyê pezê xwe diajo ser erdê Birtalikê.

Li wê demê, yanî li 1920an serhildana Xoybûne derdora Agirî û Bazidê dimeşe.



Mistê Alê konê xwe vedigire û xwarziyên xwe tevî xwe dibîne. Vana cotkarîyê dikin û dişuxulin. Wanî jî debare xwe dikin.

Jina Mistê Alê navî xwe Dodik e. Ew jî eşîra xwe diterîkîne û tev şuyê xwe bar dike Birtalikê. Lê vana pê nedihêşînîn ku mirov ji her parçeyên Tirkiye û Kurdistanê li wê demê koçber dibin û li ciheka rihet digerin.

Li piştî her tiştî navbarê serhildana Xoybûn, yekemînê heta sêyemînê. Berê du malbatên ji herêma Serhadê tên gundî Birtalikê. Mala Feto ji Agirî û Mala Silo ji Wanê.

Vana li hezêmeta serhildana Xoybûnê di navbarê sala 1926- 1930î de direvin tên cem Mistê Alê. Mistê Alê va malbatên xerib dihewîne û dike bin bervedarîya xwe. Vana dişuxulîne, şûnê dide van û dike nav xwe.

Pêla din jî bi du malbatên din ji derdora Gumuşhaneyê Kelkitê tên ba Mistê Alê. Wate, malbata Teyyar û Gudiş. Vana jî koçberên kurd in.

Mistê Alê mêvanperwerîyê ku ji mala Silo û Feto re dilêminê, ji mala Teyyar û Gudiş re jî neêvişîne. Şunê û kar dide van jî û heta xanîyan jî ji van re çêdike. Yani bi rastî van miletî hewcê kesî nake.

“hevdu neêşînîn sewa çar rojên dinê bi dere veqetîne heye mirinê biyê hêsira qedere”

Dûv re Zeydo tê gundî Birtalikê, ji ber ku ew ji sebebên nenas mirovekî ji malbata xwe li bajarê yozgatê dikuje û direve Birtalikê, heta ku Mistê Alê lê rast tê. Mistê Alê mirovekî pir xizmetkar, xêrxwaz û mêvanperwer e. Ji perwerde û xîreta xwe re bêsînor e, ji Zeydo re jî rindiyê dike. Her wiha Zeydo ji Omeran dizewcine, bi keçaka kurd re.

Piştî ku çar malbatên kurd hatin, malbateka tirk jî hat hewandine. Hem mala amediyan ku ji paytexta Kurdistanê, Diyarbakirê tên herwekî navê malbata van qest

dike, Mistê Alê dihewîne. Ew jî dibe ku ji serhildana Şêx Saîd şûnda tèn wê derê.

Feqet hatina Hussîn, kurdekî elewî ji derdora Erzingan û Dêrsimê ne ku yekî simbêl qeytan bû wekî pîrên elewîyan, meseleyeke gelek balkêş e. Hussîn dibe ku piştî serhildana Dêrsimê li dema Seyit Riza direve û xwe digihîne pîyên Mistê Alê. Kekê „Misto“ Hussîn jî bi mal dike û dizewcîne. Tu car ji bo elewîyetîyê wî nehewîne.

Girîng e ku ol û asilên van mirovan qet gelê Birtalîkê nedayê ber hev, çimki ji ber her tiştî li wê demê siyasetkaran bi navî ol û gelan derdor distqilandin. Li dema hilbijartina muxtarîyetê, gava ku yek ji zuriyetê Mistê Alê navzedîya xwe dadîne, herkes ji van malbatan rayê xwe venedize.

Rojekê kesek ji kulfeta Mistê Alê pirs dike: Çawa dibe ku ev mileta li me civîya?

Dodik ji dibêje: “Lê gidî! Bile, ma werin bibin ciranên me û em kêf bikin tev hev. Tenêbûn tişteki xirab e!

Ev îfada belkî ji bona pir kesan îfadeyêke saltgir û hêsan e, lê belê ev gotineka felsefî ye. Belkî Dodik bi xwe jî hay lê nebiye ku naverokek felsefî di nav de heye.

Sernavê wê gotarê gotinê Dodike asil heykat dike. Herweha ev sirf nimûneka li ser aşitîperwerîya gelê kurd nîne, feqet ev sipartina nasnameya wê gelî dilêmine. Yanî qesda min ev e ku heta îro wê civatê nasnameya xwe parastîye. Mesele îro du neviyên Mistê Alê beşdarî nav doz û hereketa PKK bûn^(*).

“sermakê ketiyê piştî min
ji serma havînê

tu talibê hiqûqe ye kare te ciye
li ciyayên Şirnaxê

- (1) Diya ramazan harmanci li ser kurê xwe dema ku şehid ket
- (2) Hesreta gerillayên li ser dayikên xwe (Ali Harmanci)

li bînîya Mêrdînê”^(*)

Dîsa ji gundi Birtalîkê ji mirovatîyê Mistê Alê du kesên din beşdarî têkoşina PKK bûn.^(**)

„dikevim hemêza te wekî mare nav xwelî
tirba min li hêla te bikolîn derdora bajarê qulê“⁽²⁾

Heta ji nifşê kevn neviyêkî Mistê Alê -bi navi Hasan Harmanci tê nasîn- tev partiya PSK li Elmanîyê bû li salên 1970an. Pozîsyona xwe çiqas ji rêze bibe jî bi niştîmanîya xwe hertim paşîyê doza kurd bû.

Heke civatek kîjan li hişa nasnameya xwe bîyê, hîngê dikare bi hesasiyeta xwe alîkariya mirovên din bike. Îro bi rastî kesek ji malbat û zuriyetê Mistê Alê bi zimanî tirkî deng nake, heta ku li derên wekî konsulxane yan jî meqamên din gerek bû.

Herkes dizane ku Mezopotamyaya cihê şêr û de'weyan e. Her çeştê millet di Kurdistanê de derbas bûn. Ji Farsistan, Afganistan yan ji derên weki Arabîstanê hatin û xwesipartîyên çiyayên Zagros û Mezopotamyayê. Helbet diyalog di navbarê van miletan çêdibe û herkes hevdu qebûl dike û rêzdar dike.

Van mirovan mecbûrî debarkirina hevdu man.

Ev e! Mistê Alê çanda Mezopotamyayê tu car wenda nekiriye!

Gelê kurd û axa Mezopotamyayê bi fikra min belkî landika civatên pirparêz e. Ji bo vê Mistê Alê bi hewandina vî mileti nimûneyek e di derheqê civatên pirparêz de.

Ez hêvidar im ku min bi gotara xwe alîkarî da çanda kurd pitir çanda kurdên Anatoliya navîn.

(*) Ramazan Harmanci û Ali Harmanci

(**) Şenol Gungur û Osman Rokat

HEŞKÊM

Nuh Ateş

Giregirên Tirkîyê perwerdeya kurdî qebl nakin û dibên bi wê Tirkîye ji hev da bikeve û parçe bibe. Ji ber vê jî perwerdeya yekzimanî yanê tene bi tirkî diparêzin û wê li ser her kesî ferz dikin. Li ba wan yê ku ketine pê deweya perwerdeya kurdî yan pîrzimanî parçebûna Tirkîyê dixwazin.

Wan rojan li Tirkîyê li ser deweya kurd û çarelêkirina wê mineqeşe tê kirin. Lê êlîta Tirkîyê ya sîyasî huro ji perwerdaya kurdî yan duzimanî qebl nake. Xêyrî DTP partîyên din yê ku di perlementoyê da bi cî ne, AKP, CHP û MHP perwerdeya kurdî qebl nakin. AKP tenê "dersa bijartî" ji bo zimanên xêyrî tirkî ya li ser esasa dilxwazîyê dilkirî xuya dike.

Serwezîrê Tirkîyê Erdogan sala çûyî di serdana xwe ya Swedê da gotibû "li Tirkîyê ji tirkî bêtir zimanekî din î resmî tune, nabe!" Di eynê salê da, wî di hevdîtina xwe ya bi sazîyên sîvîl yê Amedê va gotibû, "li tu derên dunyayê perwerdaya makzimanî tune!"

Mîn çend rojan di ber vê di gezetekê da xwand, serokê partîya mixelefeta mezin ya parlementoyê Tirkîyê, Denîz

Baykal tê da kesên ku perwerdeya kurdî yan makzimanî dixwazin bi heşkêmîyê ("ehmak") suçdar dikir.

Ma parçebûna welatekî bi perwerdeya zimanên ji hev cihê çiqas rast e? Bi ya Baykal be, li rûyê dunyayê pîr dewlet hene ku ji ber heşkêmîyê parçe dibin yan li ber parçebûnê ne.

Destek nimûne:

Li Kanadayê frensî û îngilizî du zimanên resmî hene yanê perwerde bi du zimana ye.

Li Bîrîtanya Mezin îngilizî li her derê zimanê resmî ye, lê skoçî, gelêrî, walezî jî li herêman resmî ne û zimanê perwerdeyê ne jî.

Li Îtalîyayê îtalî zimanê resmî ye, lê li herêman, nimûne li Tîrolê almanî û ladînî jî resmî ne.

Li Îswîçreyê almanî, frensî, îtalî û retoromanî çar zimanên resmî hene.

Li Belçîkayê fîmanî, walonî û almanî sê zimanê resmî hene.

Li Espanyayê espanî li bitûnî Espanyayê zimanê resmî ye û baskî, katalanî û galîçî li herêman resmî ne.

Li Afrîkaya Başûr 11 zimanên resmî tî bikaranîn.

Li Hindîstanê hindî, ênglizî û 17 zimanên herêmî resmî ne.

Li Îraqê, erebî û kurdî her du jî zimanên resmî ne.

Li Finlandîyayê li hêla finî swêdî jî zimanê resmî ye.

Li Kosovayê, albanî û sîrbî du zimanên resmî hene.

Li Awisturyayê almanî zimanê resmî ye, lê li herêman krowatî û slovenî jî wekî zimanên resmî û perwerdeyî tên qebûlkin.

Ma niha wan dewletan giştikan xwe şaş kirine û berê xwe dane rêya parçebûnê? Kî heşkêm e, êlîten wan dewletan yan elîta sîyasî ya Tirkîyê?

Ku tu mêla xwe didî rastîyên wan dewletên dunyayê ya pirzimanî û guh didî ser gilî û gotinên êlîta Tirkîyê, tê bibêjî êpîdêmîya heşkêmîya sîyasî li yên Tirkîyê pêyda bûye. Ma li wir zîyana vê êpîdêmîyê ne di ser êpîdêmîyên din giştan ra ye?

Çare yan derman çî ye? Yan jî Tirkîye kîngê parçe bibe?

Çend hefteyan berî vê, serdarê TTB (Yekîtîya Hêkîmên Tirk) Gencay Gürsoy di roportajeke xwe da got "ku perwerdeya kurdî nebe Tirkîye parçe bibe!"

Malperêka nu ya gundê Kelhasan, www.kelhasan.ch

Ev malpera, www.kelhasan.ch ji aliyê gundiyên ji Kelhasan ku li Îsvîçrê dimînin û Fonda Ceneza ya ku bi vê platformê ve girêdayîye, tê çêkirin. Bi rîya vê malperê hem agahdariyên komelê û Fonda Cenazê û hem jî gundê Kelhasan bi endamên xwe didin nasandin. Ji bo ku ev bi rêk û pêk înfomasyon, dîrok, malbatên gund, çand, folklor, henek/yaranî, klam/stran, lîstîk û çîrokên xwe di vê malperê de berhevkin û biparêzên, lazim e herkesek ji aliyê xwe de, ci dizane ji malperê re bişîynin. Derîyê malperê ji we giştîkaran vekirîye! Eger li ba we; resim/wêne, zanebûna li ser malbata we, video, yaranî, çîrok û wekî din çî hebe, ji malperê re bişînin. Werin, em bi hev re malperê bo pêşeroj û zarokên xwe dewlemend bikin û rind bixemilînin.

www.kelhasan.ch

Tama derewan

MEM XELÎKAN

Carna hate serê we, nizanim. Çend sal in, li doralîya me kesek bimre, ji bo serxwaşîyê em diherin tazîyê. Li wan malên ezni, hûn dizanin siftê Qur'an tê xwandin, fetîhe ji rehmetî an ji rehmetîyê re tê şandin. Dûa, tu ê serxwaşîyê bidî malbatê. Mezinên malbatê û kesên li wira jî ê xêrhatinê li mêvanan bikin û li dil û xatirê wana bipirsin. Astengîya mezin, tu yê çing dest bi dengkirinê bikî û sohbetê ji hev kî. Carcaran, hela ku rehmetî ciwan e û li cemeetê mezinekî şorxwaş jî tuneye, herkesek ê serê xwe di ber xwe ke û bêdengî yê pêk were. Ez bi we nizanim, lê ez ji bo wê rewşê pir bêrehetî dibim. Lê Xwedê ji wana razî be, gundê me Xelîkan û gundîyên me, bi kultura xwe ya yarenî û henekan pir pêşya çûyîne. Êş, çiqas gir dibe bila bibe, yên ji bo êşê sivik bikin bi wan yarenî û henekên xwe, cemeetê şên dikin.

Îsal ji bo serxwaşîyekê çûme gund. Dawîya hefte wû. Ji bo wê gundîyên me yên li dervayî gund dijîn, yên li bajaran bi piranî li mala ezni wûn. Di dû xêrhatin û xatir pirsînê û çay vexwarinê dîsa

bêdengî çêbû.

Hemoyî ji hevalên li cemeetê ji Silo re got:

– Silo, de du derewan bike cemeet guh bide ser te.

– Kek Hemo, welle cemeet dizane, ez derewan nakim. Min zû va ye dev ji derewan berdaye. Lê çî derawa bikim, min di zaroktiya xwe de derew dikiirin. Lê herkesek dizane derewên te pir xwaş in û tu zîyanê jî nadin kesekî. Ha tu dixwazî cemeet guh bide ser min, ez serpêhatîyeke xwe kat kim.

Hemo:

– De xwe bi qîmet meke, tu yî çî bêjî bêje.

Silo:

– Ezî hê zarok wûm, şeş heft salî wûm. Rojekê bavê min, bi destê min girt ez birim ber mizgefta gund. Mezinên gund, heroj li ber camîyê berhev dibûn û sohbet dikiirin. Bavê min dixwast, ez guh bidim ser wana ku kultura mezinan bigirim. Ez zarokê wê wextê me hûn jî dizanin, wekî cin im. Her mezinêkî deng dikir min, şor ji dev digirt û

derew dikirin. Dûra jî çerxê bavê xwe yî rehmêtî dibûm, min digot: Ne weng e kekê? Ji bo ku derewên xwe bi wî testîq bikim. Bavê min jî, ji bo ku perê min î neçê navê derva, li doralîyên xwe mês fikir wek ku bêje erê, serê xwe dihêjand. Bavê min mês kir, ne yek ne dudu paşîya derewên min ê nayên, rahişte destê min û got: "Rabe, em herin mal." Em çûne mal. Dayîka min a rehmêtî li ber malê ye. Bi hêrs rahişte çengê min, ez avêtim hemêza dayîka min. "Maga bênamûsê, vava yî derewîn ne lawê min e. Bêje, te va pînca ji kê peyda kir?"

Hemo got:

– Bavê te, golikê xwe zû nas kirîye.

Dû gotina Silo re, Xelo şor girt û ji hevalên li cemeetê Mest nîşan da.

– Hevalno, hûn jî dizanin çend mehan ber vê, Mest nexwaş ket û heft deh rojan ket qomayê. Li nexwaşxana Enqerê raket. Hûn dizanin, hevalê min î canecan e. Ez çûm ziyareta wî. Hê ez li ber balgiha wî bûm. Min di Mest di cîha

de xwe dilevîne. Min di hundirê xwe de ji Xwedê re dua kirin. Ji bo ku hevalê min hêdî hêdî tê xwe û Xwedê wî li me vedigerîne. Paşê Mestê çavên xwe ji hev kirin min zanî ew ji qomayê tê derê û tê xwe. Çend deqan şuva Mest hate xwe. Ji min re got: "Xwedîyî mala min li ku ye? Ka mêrê min?" Ya hûn bizanin, serê Mestê çeliqî wû û her tiştêk tev li hev fikir. Dema ku Mest ji qomayê bi derket wî xwe jin dizanî û li mêrê xwe digerî.

Vîqevîq kete cemeetê û kenîyan.

Mestê:

– Ha magî derewîn. Min kênga wer got? Lê min ji te re got: Eşê, avekê bide min. Dema min çav vekirin tu dîyî, ji min tu Eşa xanima min î.

Hemo:

– Aha, cemeet we dî. Bi du merîyan derewek kirin, ew jî heq nekirin. Ji kî ku Xelo û Mestê dest bi derewan kirin, tamma derewan jî nema.

Îzbend

Nuhê Hecê

Kokê gotina îzbend ehtimalek e ku "hêzbend" be û ji du şora, "hêz" û "bend"ê peyda bûye. Yanê hêza bendkirî. Her gotinekê serpêhatiyê xwe heye. Ji gumanê ne dûr e ku "hêzbend" di çerxa zemên da hatiye guhêrtin û berê bûye "hîzbend" û paşê "h" jê da ketiye bûye îzbend.

Di ferhenga kurdî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê da ew bi awayê "îzband" hatiye binavkirin û meneya lawaz (bi tirkî: arık) lê hatiye barkirin.

Di kumancîya Anatolîyê da li hen deran awaya îzbend tê bikaranîn û meneya xwe jî jar e. Pir cara ji jarên di nav kerîyek pez da dibên, "îzbend". Kurdên Anatolîyê ji gotina îzbend lêkerêkî hevdudanî çêkirine. Ji vedana berx yan kavirên jar ji yên çê ra dibên, "îzbend kirin".

Tarixzanê Yonan Herodot dibê, "ji hêla avadanî û bi pir kerîbûnê di ser Frîgya ra welatekî nas nakim" Welatê Frîgya nava Anatolîya bû. Bi hezaran sal ji Frîgîyan şûn da li nava Anatolîyê bi sedan salan kerîyên Kurdên Anatolîyê jî diçêrîn. Her gundekî kurd li wê derê neh û deh kerîyên xwe yên pêz hebûn, kerîyên pezên bişîr û nêr. Bazara pezfiroştinê ya bajarên Anqere

û Stembolê ji kerîyên Kurdên Anatolîyê bi gihan bû. Lê huro li ba Kurdên Anatolîyê pez nemaye û kevnemîrasa bavûkalan ya pezxwedîkirine miriye.

Tê bîra min, wexta ku tucarek dihat gundan û dixwazt birek pez, berx yan kavir bîstine, wi berê ew îzbend dikir. Yanê yên jar jê kêrî vedidan û li ser yên mayî bazarî dikir. Qala yekî dikirin û digotin, gava ku tucarek dihatiye û pezê wî bîstine, wî bixwe berê bi dizîkî pezê xwe îzbend dikiriye. Yên pir çê ji kerî vedidane û vedişartiye. Digotiye, "ku yên pir çê di nav kerî da nebûn, hîngê yên jar zêde bi ber çavên tucêr nakevin û ew ê kêrî îzbend bike". Wî yên çê ji yên din cihê û bi bihakî giran difroştiye.

Îzbend kirin ji bo tiştên din û ji bo însanan jî tê bikaranîn.

Li gundê Xelikan (Karacadag-Kulu) qala serpêhatiyekê weng tê kirin:

Rokê cîran û heval hatine mîvandariya Hesê Hecê. Hesê xurme îkrame mîvanên xwe kiriye û xwaztiye ku pê devê wan şêrîn bike. Xurmê di turikekî cawînî da bûne. Hesê turikê xurmeyan li ber mivanan gerandiye û her yekî yek jê helnaye.

Dor hatiye Behremê Hesen. Wî dest li nav turikê xurmeyan gerandiye û dest lê gerandina wî dirêj ajotiye. Hesê gotiye, "Behrem çir bû, ya ku helnî xurmek bû, çima te veqas dirêj kir!? "Li wê navberê Ûsikê Qerê şor helnaye û gotiye, "Heso tû dizanî ku Behrem çima ma derengîyê, ew î xurman îzbend dike"

Çerxa sîstema civatî ji însanan îzbend dike. Li hêlekê serdar û sermîyandar li hêla din karker, xizan, pala, şivan û gavan. Îdolojî û sîstemên ku li ser binyada kast, nijad, millet û ezperestîyê bi rê diherin, ji ber cihêtiyên etnîkî, mîlî, dînî, kulturî û sosyal merivan îzbend dikin. Ma Kurd, Ermenî, Yonan, Roman, Êzdî, Elewî, Yehudî, Xiristîyan, Gewende li her derên Tirkîyê ne îzbend in? Ma ew ji avûrûyên xwaztek û xususîyetên xwe yê cihê da nayên êşandin û gunekarkirin?

Koçber jî îzbendên welatên Ewropayê ne. Ew ê li Ewropa wekî îzbend tèn dîtîn, lê li welat yan gund û bajerê xwe bi qedr û qîmet in. Li derên din çing e nizamim, Kurdên Anatolîyê yê li Ewropayê, wexta ku li tetîla havînê tèn gundê xwe ji koçberîtiyê derdikevin û qalikê îzbendîtiyê ji ser xwe diavên. Hen ji wan, di bin da tomefilên merqegiran û bi danana xaniyên mezin û giranbiha xwe wekî axa û begên gund yê berê dibînin. Xagîya dikin û heta bi çavekî piçûk li hemîzbendên xwe yê berê mêz dikin.

Min bi guhê xwe bihîst, yekî ji Xelika

li Elmanyê di sohbetekê da got, "di sayê Ewropayê da, îzbendên me gî bûn meriv, bûn zêr"

Yên serdest îzbendan di jêr xwe ra dibînin û qedr, qîmet, heq û huqûkên xwe rewayî wan nabînin. Li gundên Kurdên Anatolîyê jî meriv dibe şahîdê vê rastîyê.

Li wir jî, nimûne Gewende û Mihecîr piçûk tèn dîtîn. Ji mineqeseyên di malpera Zincirlikuyu da meriv tê digihê ku Gewende 50 salî di ber vê ji Gundê Omê (Zincirlikuyu-Kulu) hatine qewitandin. Omerîyan jî du salan di ber vê Mihecîrên xwe yê Merdînî bi zorê ji Omeran (Tavşançalı-Kulu) biderxistin.

Li wan salên paşîyê Gewende di saye hunera xwe ya muzîkê da tenekî bi qîmet bûne û qezenca wan ji dohl, dawet û şahîyan ne xerab e. Nasekê qal kiribû, xizaneke li dohleke gotiye, "xwaz bi Gewendan, rind pera qezenc dikine, xwazika ez jî Gewende bûma"

Malpera Zincirlikuyu kampanya îmez vekiriye û pê ji Gewendan baxşandin tê xwaztin. Hewldaneke di cih da ye û layîqî pesandin û pirozkirinê ye. Payîza îsal li dohleke ez raste berpirsyarê malpera "Kurdên Kirşehîrê", Mile Kara hatim. Di sohbeta me da dor hate ser kampanya malpera Zincirlikuyu ya li ser Gewendan. Mile got "xwazka navê, 'Gewende jî insan in, em gî Gewende ne' li kampanyê kirina"

28.11.2009

Esrara Kaso, kêf û sonda Heydo

Muzaffer Özgür

Meha gulanê bû û li Anatolîya Navîn bihar hatibû. Ro dibiriqî. Erd germ bûbû û giraniya zivistanê ji ser erdê rabûbû. Tîrên rojê jîyan germ kiribû û gundîyan ji ber germa rojê xwe avetibûn ber sîya dîwaran.

Li gund bax û baxçan heşin dikirin, daran gul vekiribûn û bîhneka xwaş li ser gund belav dibû. Li nav gund dengandida hev. Ji aliyekî traktorek dihat û ber va çolê diçû, li dû pûlix hebû. Ji aliyekî din va jî dengê kurikan dihat, li ser rîya dibistanê dimeşîyan û dilîstin. Çûçikên ewra dabûn dû hev, difirîyan... Jîyan xwaş bû.

Li ber dûkana Hesê, cemaata gund gehîştibû hev û li ser rewşa welat sohbet dikirin. Rewşa dewletê nebaş bû û çend salan berê leşkeran dest dabûn ser. Ji ber wê jî îlonê bi şûn da leşkeran erîş dikirin ser gundan û gundî ditirsandin. Xwaşbûna jîyanê da carcaran jî zordarî çêdibûn.

Bîstekê bi şûn da cema leşkeran giran giran ber va cemaatê dihat. Gundîyan xwe berhev kirin û sohbeta xwe nû kirin! Serleşker bi lez peya bû û leşker ji cemsê derketin her yekî xwe dabû alîkî û sîleh jî di destan da bûn. Serleşker ji gundîyan ra got:

– Li gora agahdarî û îxbaran li gundê we li bax û baxçan da esrar hatîyê reşandin, em ê kontrolekê bikin rastê an na. Mixtarê gund bersiva serleşker da.

– Tiştêkî weng tuneş serleşker, ne rast e. Gundî esrar çî ye nizanin bawer bike.

– Mixtar tu were em gerekê bikin di nav gund da.

Serleşker, mixtar, esker û beqçiyê gund ketin rê. Serleşker di pir baxçan da kenevir tespît kir, lê mat mabû ku çawa eşkere di hemû baxçan da kenevir hatibû çinandinê, fahm nedikir. Ji mixtarê gund dipirsî:

– Mixtar, ev çî ye lo, gundîyan bi eşkere kaçaxçitî kirine ma tu nizanî. Li pir baxçan da kenevir hatiye çandinê. Tirs û xofa wan tuneş. Ew yasax e yasax!...

– Bi Xudê komutan ew heşinayî pir e, le ji bo çî û çawa hatiye çandinê kes nizane. Gendigelênê, dema ji bazarê toxim hatin kirin ew jî belav bûye. Bi rastî ji bo heşinîyê gundîyan jênekirin, ew nizanin esrar çî ye.

– Mixtar, hemû mêrên li gund dijîn bi anonsekê li ber camîya gund berhev ke, em herin ba cemaata we.

– Mixtarê gund ji bo daxwaza serleşker emir da beqçiyê gund ku mal bi mal bigere û bi alîkarîya xoceyê gund bangekê bike.

Ji camîya gund dengê bangê bilind dibû:

– Dikkat, dikkat!... Karakol komutanînin emridir, köyün tüm erkekleri hemen caminin avlusuna gelsinler, gelmeyenler jandarmalar eşliğinde zorla getirileceklerdir. Dikkat, dikkat!...

Li nav gund tirsek belav bûbû. Ew çî bû ku bi bangê, mêrên gund dawetî ber camîyê dikin. Bi lez, xort û kal, mêran berê xwe dabûn camîya gund. Li ber camîyê komutan bi hers bû. Cixara xwe kiribû ber lêvan, bi çavekî nebaş li gundîyan meze dikir. Mixtar got:

– Komutan beg gundî gehîştin hev.

Komutan rabû ser nigan û got:

– Gundîno! Li bax û baxçan kenevîr hatiye çandîn. Ji kenevîr esrar tê çêkirin û ew li gora qanûna me sûc e. Ma hûn nizanin. Me lîstek respît kir ku li wan baxçan gerek heşinahîya kenevîrê wara pûçkirin û bi agir bê şewitandinê. Eger di nav we da kesên bi wan tiştan dizanin hebin ma gavekê peş da derkevin. Em niha li gor lîsteya xwe, we dibin merkezê. Îfadên we gerek bên girtin. Mehkeme ê biryarê bide.

Rûspîyên gund tirkî fahm nedikirin û li dor xortan rûniştîbûn, wan jî ji bo wan gotinên serleşker werdigerandin kurdî.

Gundîyan li hevûdu meze dikirin û bi tirs çavên xwe berdabûn erdê. Serleşker:

– Çavuş, lîsteya ku we amadekirîye, bixwîne, navên ku hatin xwandin ma werin alîyê çepê. Eskerek meşîya û serleşker silav kir, got:

– Serseri komutanîm.

– Hasan K., Kemal Y., Bekir Ö.,... lîste hat xwandin. Serleşker:

– Ma wan kesên ku navê wan hat xwandin bi eskeran va herin bax û baxçan da kenevîrê jêkin û di agir da bişewtînin. Mixtar, otobûsa gund hazir bikin, gundîyan bibin qezê.

Mixtarê gund got:

– Bi ditîna min ne gerek e gundî niha herin qezê komutan beg, êvar dibe, soz ez sibê hamûyan berhev dikim û bi otobusa gund tînim. Bawer bike. Serleşker got:

– Nabe mixtar, gerek suçdar bên cezakerin, emirê min e, destê xwe lez bigrin.

Dema cemsî eskeran ji gund derket, otobusa gund jî li dû diçû û ber va qezê dan rê. Mixtar û çend gundîyan jî bi erebên xwe dabûn dû.

Serleşkerê mezin yê qezê çend salan berê dema ku mixtar leşker bû, ew serleşkere wî bû. Mixtar li mala wî mabû. Mîna ku mixtar lawê serleşkerê mezin bû. Ew li qezê çû mala serleşkerê xwe û hal û hekata xwe jê ra anî ziman. Serleşkerê mezin got:

– Mihemed oxlim tu dizanî va

sûcekî giran e. Ma te qet nedît di bax û baxçên gund da kenevîr heye, fedî bike oxlim. Ez bawer im bi te, ez sibê li meselê mêze dikim û em ê gundîyan serbest berdin. Tu niha havalê xwe bigre û herin gundê xwe.

Sibê li qezê, li ber cihê leşkeran gundî hatibûn ba hev. Demekê bi şûnda gundî hatin berdan. Leşkeran ji bo sûtê ku hatibû kirin, xwe berdabûn û çend xort birindar kiribûn. Lê gundî bi buyerê razî bûn. Hemû bi hev re çûn gundê xwe.

Mixtar li gund, gundî agahdar kirin. Çend rojan bi şûnda gerek xwarineka mezin ji bo heyeta ji qezê were, amade bibe. Gundîyan di navhev da pere berhev kirin û haziriya xwarinê dest pe kir. Çend rojan bi şûnda li ber mala mixtar çend pez hatin şerjêkirin. Kevaniyên gund di telaşeka mezin da bûn.

Di destpêka xwarinê da serleşkerê mezin got:

– Gundîyan esrar çandibûn. Toxim jî bi toximên ji bazarê sandin ra hatibû. Gundîyan di jîyana xwe da esrar nedibûn û wek heşinayî didîtin. Di bax û baxçeyên gund da esrarê heşin dikir. Me gundî agahdar kirin û hemû malbatan esrara di baxçan da pûç kirin û avêtin agir, pirs zelal bû, em ji bo mêvandarîya we spas dikin, de afiyet be.

Pirs zelal bûbû, gundîyan bi çoşeka mezin xizmeta mevanên xwe kirin.

Çend meh derbas bûbûn. Li gund dawetek hebû. Havîn hatibû û tîra rojê xelkê gund rivandibû ber sîya mala Xelê. Mala Xelê daweta lawê xwe Beyro dikirin. Ji bo muzîka dawetê ji gundê Kutlixanê Heydo anîbûn. Dengê dol û zirnê li ser gund belav dibû. Xort û keç ketîbûn bazdanê. Oxintiçîyan li odan çay vedixwarin, sohbet dikirin. Mehşer hebû.

Kaso, hevalê Beyro bû. Ji bo amadekirina dawetê wezîfe girtibû û li cîhekî rûnedinişt, xizmeta însanan dikir.

Êvarê xortên gund bi dizikî arak vedixwarin. Ji aliyêki da jî Heydo miruz tîrş kiribû û bi Kaso ra behsa bêkefbûna xwe dikir. Dema xortan ji Heydo stranên klasîkên kurdên Anatoliyê daxwaz kirin, Haydo got:

– Bi şeref eger min niha bi tutuna xwe ra esrar vexwara, min ê ji bo we heta sibe stranê bigotana. Kêfa min tûne. Kaso got:

– Walla tu niha bejê ez sibe ji te ra esrar tînim. Çawên Haydo bi gotinên kaso vebûn.

– Te çî got lo bira, ma li wê çolê anadolîya navîn esrar li ku yê. Heneka meke loo. Ki dizane esrar çî ye? Ma wira enqerê itfaiyê meydanîyê. Kaso got:

– Bi şeref ez tînim, em niha kêfa xwe bikin, sibe tu ê bibinî. Haydo bawer kir le şika xwe jî got. Heta sibe ciwanên gund bi kefa serxoşiyê govend girtibûn.

Heydo hunera xwe pêşkêş dikir.

Dema leşkeran ji baxçan heşinahîya kenevîrê berhev kirin û şewitandibûn, Kaso jî di baxçê xwe da agirek dadabû û heşinahî dabû ser agir. Ji aliyekî jî qesî nîv çalekî berhev kiribû û bi dizikî di bin kayê da veşartibû.

Dem hatibû û xezîne gerek bihata derxistinê. Ma Heydo bîr dike. Sibê bi ereba mala xudiyê dawetê hatibû ber mala Kaso û bang dikir.

– Kaso, de rabe loo, ro hatiye nîvro, ez hatim te bibim mala ape Xelo, em tevûhev xarinekê bixwin. Dawet li benda te ye. Bi dengê Heydo ra Kaso rabû. Li ber mala Heydo bi dîya wî ra sohbet dikirin. Kaso got:

– Ma çir bû loo, zave hat revandin hûn telaşê dikin, ez tîm. Heydo got:

– Oxlim de rabe, te êvarê mîna mîrekî gotinek kir, ez li benda te me. Bi şeref eger tu şora xwe nîne şûnê, ez terim gundê xwe, ma daweta we ji we ra. Birê Beyro got:

– Te çî got Heydo ma daweta me heye, tu nikanî herî, mêvanên me hene, daweta me nikanî terk bikî, eyb e lo, va gotinên te yên zarokan in lo. Kaso kenîya got:

– Heydo, bi min ra were em herin paş malê, gotinên min hene. Ketin destê hev û berva paşmalê çûn. Ketin hundirê xaniyê kayê. Kaso di nav kayê da çalek derxist û da Heydo. Heydo mat mabû. Dengê xwe nedikir, serxoş bûbû. Çal vekir heşinahî bi destê xwe girt û got:

– Oxlim ma tu hizirî lawo, ev çî ye? Çalek esrar, bavo mala min şewiştî, ez dikanim salekê tutunê bi kêfeka xwaşîk bikîşînim. Eeee em çî bikin? Kaso got:

– Çî? Çî bikî, ez soza xwe tînim şûnê, ma te bîr kir? Heydo pir kêfxwaş bûbû. Kaso maç kir û got:

– De bêje bavo, çî daxwazên te hene.

– Daxwazên min hene kekê, tu dizanî ez xwande van im û kurdekî di nav sîyasetê da me. Armanç û hêviyên me hene. Gerek tu li vir li ser şerefa xwe sozê bidî min ku tu ê hertim li dawetên kurdên me însanan teşwîqî stranên me bikî, govendên me bidî lîskandin, xortan bi zirna xwe perwerdeyî muzîka govendê bikî. Dawetên me gerek bibin dibistanên kultura me. Stranên klasîk li cemaatan bêjî û bistirêyî. Li Kutluxe zaneyên muzîka me û daxwazên me werin perwerdekirin.

– Erê çavê min, ez bi şerefa xwe sozê didim te ku van daxwazên te ez ê heta mirina xwe di hunera xwe da bikim. Kaso, çal teslîmî Heydo kir û hevûdû maç kirin. Dema derketin ber malê çalê bi ka kirin ereba mala Xelo.

Çend rojan Heydo li dawetê bi kêfeka mezin zirnê lêxist...

Heydo û Kaso bûbûn dostên hev. Li her dawetekê Heydo digot:

– Kaso, oxlim ez sonda xwe tînim şûnê. Tu dibînî...

Roja zimanê zikmakî û Manx

Ecevit Yıldırım

Pakistanê di sala 1952an de zimanê urdu wek zimanê fermî qebûl kir. Ji ber ku zimanê urdu li rojhilata Pakistanê zimanê zikmakî yê tenê ji sedî sisîyê şênîyan bû, gelê li rojhilata Pakistanê li hember wê qirarê nerazîbûna xwe nîşan da. Di xwepêşandanên li bajarê Dakayê, yên di 21ê sibatê de, 5 xwendevan miribûn. Gava Bangladeşê di sala 1971an de serxwebûna xwe îlan kir, zimanê bengalî wek zimanê fermî û roja 21ê sibatê jî wek roja şehîdên ziman qebûl û pîroz kir.

Neteweyên Yekbûyî jî serîlêdana Bangladeşê ya di sala 1999an de nixand û di encam de 21ê sibatê wek roja zimanê zikmakî ya navnetewî îlan kir. Ji sala 2000an vir ve jî di rêberiya Unescoyê de tê bibîranîn û pîrozkirin.

Di nexşa zimanên zikmakî, ku di sala 2002an de ji hêla Unescoyê ve hatibû weşandin, 6700 zimanên ku li dinyayê têne dengkirin wek dewlemendiya tevahîya dinyayê hatin qebûlkirin. Dîsa tê ragihandin ku ji wan 6700 zimanên ku têne dengkirin, piraniya wan bi xetera tunebûnê va rûbirû ne.

Gelên ku zimanê wan di bin xetera tunebûnê de ye, wê rojê wek derfet

dibînin. Bi xebat û çalakîyên cûrbecûr bala raya giştî ya navnetewî dikşînin û Unesco jî piştgiriya wan dike.

Xebata Unescoyê ji bo zimanên di bin xeterê de, her wiha ji bo zimanê kurdî ya li Anatoliya Navîn jî watedar e. Ji ber gava zimanek mir, ji nuh ve zindîkirina wî ne mimkîn e.

Pir caran ji bo zimanê îbranî tê gotin, ku di demên hemdem de ji nuh ve hatîye zindîkirin. Ew yek ne rast e. Zimanê îbranî tu carî nemiribû. Ji ber zimanê îbranî wek zimanê îbadet û stranbêjiyê bû, tim dihate bikaranîn û bihîstin. Tenê bi avabûna dewleta Îsrailê di sala 1948an de, zimanê îbranî bû zimanê fermî û zimanê rojane yê gel.

Gava em li kurtedîrok û rewşa zimanê manx dinêrin, ew rastî bi awayeke hîn êşkere û zelal tê famkirin.

Di sedsala 18an de nêzikî tevahiya 20.000 şênîyên girava Isle of Man bi zimanê manx deng dikirin. Bi dagirkirina giravê ji hêla Qraliyeta Britanyayê ya di sala 1765an de û zextên ku zimanê manx wê çaxê rûbirû ma, rewş hate guhertin. Zimanê ingilîzî her ku çû şûna zimanê manx wergirt. Li ser

wê rewşê, bi armanca parastina zimanê manx di sala 1899an de saziyek bi navê Yn Cheshaght Ghailckagh ava bû.

Di serjimariya sala 1901an de, 9,1% ji şênîyên giravê dan zanîn ku ew bi zimanê manx dizanin. Di sala 1930an de kesên ku zimanê wan yê zikmakî manx bû û pê dizanibûn, tenê bi qasi tiliyên destan mabûn. Di sala 1946an de kesên ku zimanê wan yê zikmakî manx bû, tenê 20 kes mabûn.

Loma jî bi armanca parastina bilêv-kirina orjînal ya zimanê manx, saziya Yn Cheshaght qeyidên bi deng kiribûn. Gava di sala 1974an de kesê bi bi navê Ned Maddrell ku zimanê wî yê zikmakî manx bû mir, zimanê manx jî pê re ji holê rabû.

Di vê navberê de, di encama kar û xebata çalakvanên ziman, kesên ku zimanê manx wek zimanê duyem dizanibûn, di sala 1991an jî 80.000 şênîyên giravê bi qasî 634 kes bûn. Her wiha jî sala 1999an vir de, derfet ji bo şagirtên giravê heye ku di her dibistaneke giravê de zimanê manx fêr bibin.

Tevî wê, li giravê pênc berdibistan û du dibistan (Bunscoil Ghaelegh û Scoill Balley Cottier) hene ku zimanê wan yê perwerdeyê jî zimanê manx e.

Di serjimariya sala 2001an de bê ku dereceyê destnîşan bikin, 1689 kesan dan zanîn ku ew bi zimanê manx dikarin deng bikin, bixwînin û binivîsin. Di sala 2005an de jî ji 80.000 şênîyên

giravê ku zimanê wan yê zikmakî manx bû 28 kes bûn!

Ger em zimanê kurdî û zimanê manx bidin ber hev, bêguman em ê neheqiyek mezin li zimanê kurdî bikin. Ji ber zimanê kurdî yek ji zimanên sereke yê Rojhilata Navîn e.

Lê belê rastiyeke din jî ew e ku di encama siyaseta asîmilasyonê ya dewleta tirk de, coxrafya ku kurdî lê tê dengkirin her ku diçe piçûk dibe.

Di destpêka avakirina komara tirk de zimanê yekem yê tevahiya kurdên Anatoliya Navîn kurdî bû.

Lê belê îro tenê li gundên sê navçeyên Anatoliya Navîn (Qulu, Cihanbeyli û Haymana), kurikên kurd bi zimanê kurdî mezin dibin. Ger rê li ber neyê girtin, ew dever jî dê li hember asîmilasyonê bi bin keve. Îro jî her rojê bêhertir derfet hene ku xwedî li zimanê kurdî were derketin û rê li ber asîmilasyonê were girtin. Divê em ji hal û rewşa zimanê manx îbret û dersê werbigrin.

Hîn ku bi derengiyê neketiye, divê em qirara xwe bidin. Yan em ê wekî gelê Bangladeşê xwedî li zimanê ku ji hêla bav û kalan ve li me emanet hatiye dayîn derkevin, yan jî em ê mîna niştecihên Isle of Man, ji zimanê xwe bibin.

Bi vê minasebetê ez roja zimanê zikmakî ya navnetewî, li hemû zimanên di bin xetera tunebûnê de ne, pîroz dikim.

Geşta Kurdistanê II

Xayyam Rizgar Celikani

Me di ser Semsûrê re ber bi Nemrûdê ajot. Çîyayê Nemrûdê... Nêmrûd! Meriv bêzar û bêziman dimîne. Navenda cîhanê ye, rojhilat û rojava li Nemrûdê digîhîjin hev. Hem çîya bi xwe semyan e, hem jî gora Key Antiyok ronakdar e. Dema meriv digîhîje lûtkeya Nemrûdê, têdigîhe ku Key Antiyok bi yezdanan re ketiye pêşbazîyeke xetere.

Meriv hest dike ku wî xwestiye bi xwe bibe Yezdanekî dilovan. Lewma tirba xwe li ser dertapa Nemrûdê ava kiriye. Em nizanin ka keyê mezin Antiyok xwe bi yezdanên jorê da pejirandine yan ne! Lê mirov bi hestiyarîyek valahîyê li ser banê Nemrûdê li ger û seyrana tavê temaşe dike.

Kolik

Kolik navenda eşîreta Reşîyan bû. Navê wê veguhastin û kirin Kahta. Kolik weke hemû bajarên din ên Kurdistanê bajarekî zehf kevnar e û dîrokî ye. Mirovên Kolikê mîna piraniya kurdên Anatoliya Navîn bi kurmancî û bi zarê berferatî dipeyîvin.

Navçe her çiqes li cîhekî gelekî stratejîk be jî, ji mêla aborî ve ewqes

bi pêş neketibû. Em li Kolikê rawestan û çûn çêjxaneyeke li navenda navçê. Xwarina xwe gelekî baş bû. Hertîştên wan bi me nas hat. Kevçî û kodikên xwe, firaq û amanên xwe, goşt û zadê xwe hemû hertîşt bi me nas dihat. Em zehf şa bûn. Me pir kêf kir.

Semsûr

